Rûnahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1335 | 21-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Beriya her tiştî em jî mirov in

**Azê Dalaho**

Dinyaya me ya biçûk ji ber hêrsa mirovên desthilatdar û ferdperest serûbinî hev bûye. Hatiye rewşa hew, bê naskirin. Tiştên ku ti şer an jî ti hêz, nikarin bi ser bixin hene. Ev jî hêza hezkirin û demokrasiyê ye.

Ev mijar wiha ye û me şahidî jêre kiriye. Li vê cîhanê mentiqek wiha heye. Ji ber pirsgirêkên nîjadperestî, olperestî û zayendperestî çiqas mirov hatine kuştin gelo kî dizane? Rastiyek wiha heye, lê me ji bîr kiribû! Me ji bîr ve kiribû ku em jî aîdî netewekê ne. Diviyabû me karîba bi mirovên din re jî bi şêweyekî hevbeş û hemaheng bijîn. Lê kesî ne zimanê me, ne jî weke hebûn em qebûl dikirin.

Rêber Apo diyar dike ku di mirovbûnê de israr di sosyalîzmê de israr e. PKK xwedî hêz û îradeyeke pir mezin bû û roj bi roj hîn xurttir dibû. Bi vê bawerî û biryardariyê bi dehan salan têkoşîn û berxwedan kiriye. Eger wiha nebûya çima Rêbertî piştî têkoşînek ewqas e dijwar ya nîv sedsal derbas kir, partiya bi destê xwe ava kir û kêlî bi kêlî mezin kir wê fesix kiriba? Ev pirseke ku me hemûyan ji xwe kir. Di rewşên xwezayî de dema rêxistin lawaz diketin, mehkûmî têkçûnê dibûn û her pêşengekî wan seriyek dikişand. Rêxistinên welê bi xwezayî dihatin fesxkirin an jî fesix dibûn.

Di nav partî û rêxistinên sosyalîst de ya herî xurt, bi salan xebitî û têkoşîn kir jî PKK bû. Di partiyeke weke PKK'ê de hêzên bi salan şer bikin û amadekariyên şerê gel ê şoreşgerî dikirin hebûn. Eger dewleta Tirk neçûba ber lingên Rêbertî û Rêber Apo jî ev bersiv û banga dîrokî nekiriba gelo wê niha rewş çawa ba? Her kes dizane ku fermandar û gerîlayên azadiyê girêdayî biryara Rêber Apo ne û wê li ser xeta Egîd û Kemalan dimeşin. Gelo çima PKK'ê xwe fesix kir? Em bi zimanekî sade bibêjin, ev têkoşîn ne tenê bi hedefa şerê çekdarî hatiye destpêkirin. Hedef û armancên xwe pir pîroz û mirovî ne. Ji roja xwe ya yekem û heya roja îro jî bi heman hedef û armancê tevdigere.

Hedef û armancên xwe jî li ser avakirina jiyaneke azad û wekhev pêş ketiye. Li ser wê xetê jî heya îro dimeşe. Her dem parastina xwe ya rewa kiriye. Wer xweber û bêsedem çalakî nekirine. Rêber Apo dibêje, "Em neteweyek wisa ne eger hêzê me ya em cîhanê têk bibin hebe jî, em ê êrîşî ti kesî nekin. Eger hemû cîhan bibe yek û were bi ser me de jî em ê dest ji mafên xwe yên rewa yên demokratîk bernedin." Rêber Apo berê jî timî di nav hewldana pêşxistina aştî de bû. Lê dewleta Tirk bi dek û dolaban nêzî hewldanên Rêber Apo dibû.

Rêber Apo tevî vê demboriya berbiçav jî bi Banga Aştî û Civaka Demokratîk a 27'ê Sibatê re derî ji pêvajoyeke nû re vekir. Ev gava dîrokî îro di pêşengiya Rêber Apo de pêş dikeve.

Rêber Apo li pêş çavên hemû cîhanê û bi rengekî pir vekirî peyamên xwe da tevahî mirovahiyê û got: "Ez ji her wextî zêdetir ji bo pêvajoya aştî û civaka demokratîk amade me. Armanca min ji vê têkoşînê wekhevî, edalet, azadî û aştiyeke mayînde ya ji tevahî cîhanê re ye." Rêber Apo dewleta Tirk re jî got, "Eger hinceta we ji bo pêkaneanîna aştiyê PKK ye, vaye ez PKK fesix dikim." Pêwîst e her kes vê rastiyê bibîne û fêm bike ku em jî di nav de divê em ji her kesî re vebêjin bê ka çawa Rêber Apo hemû jiyana xwe ji bo pêkanîna civakeke hevbeş û demokratîk feda kir. 27 sal e jiyana xwe di nav tecrîdeke girankirî de derbas kir. Ev tehemûl û têkoşîn hemû ji bo çareseriyeke mayînde ya ji pirsgirêka Kurd û mirovahiyê re bû. Tevî ewqas zor, zehmetî û tecrîdê jî bi sebir û tehemûleke mezin pêşxistina berxwedanê di fikir, ruh û hestên me de pîroziya Rêber Apo dide çêkirin. Vaye îradeya ku hêzê û hezkirinê diafirîne. Rêber Apo heya îro jî bi vê hêzê têkoşînê dimeşîne. Şagirtên Rêbertî yên qehreman û leheng jî xwedî li ked û têkoşîna Rêber Apo derdikevin.

Rêbertiya me bi pêvajoya nû re Manîfestoya Aştî û Civaka Demokratîk pêşkeşî me kir. Rêber Apo diyar dike ku rêbertiya rêyekê dike ku ev rê ji bo pêkanîna aştî û hezkirinê yekane ye. Rêbertî careke din anî bîra me ku beriya her tiştî em însan in û jiyaneke azad jî bi aştî û civakek demokratîk e dikare pêş bikeve.

Jiyan weke wêneyekî ye. Piştî te wêne xwe xêz kir, divê tu reng jî bidiyê. Ev wêne jî tenê bi rengekî nayê temamkirin û xweşik jî nabe. Ma gelo em dikarin wêneyê xwe bi giştî şîn an jî kesk bikin? Mînak ma em dikarin asîman kesk bikin? Nabe! Em însan weke qelemên rengareng in. Ji bo kamilkirina wî wêneyî pêwîstiya me bihevrebûnê heye. Jiyan bi hev re xweşîk û bedew dibe. Bi hemû netew, ol û zayendan xweşik dibe. Wêne jî wisa bi hemû rengan xweşîk dibe. Eger em di vê baweriyê de ne ku em însan in, wê demê divê em dest bidin hev û wêneyê jiyana xwe bi hev re xêz bikin.

## Gotina Dawî



### QSD û desthilata li Şamê

**Mihemed Seydi**

Em nêzî serê salê dibin û çav hemû li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û QSD'ê ne. Di nava pêvajoyeke bi rîsk a ji aliyekî gefên dewleta Tirk, li hundur DAIŞ û barê girtîgehên çeteyan û Kampa Holê ku bi hezaran malbatên van DAIŞ'iyan tê de ne û derfetên kêm. Herwiha êrişên komên çekdar ên ser bi desthilatdara veguhêz a li Şamê ji Dêrazorê û derdora Çemê Fratê jî mirov nikare ji vê rewşê dûr bigre.

Li aliyê din, peymana 10'ê Adarê ya di navbera QSD'ê û desthilata Şamê de mijareke sereke û Rojeva bingehîn a Sûriyê ye. Hemû alî qala pêkanîna peymanê dikin û her carê QSD'ê bi nepêkanîna xalên wê tewanbar dikin. JI ber di peymanê de tê gotin ku diviya bû heta serê vê salê xalên wê bi cih bên, çav li rê ne ka çi guheriye û çi pêk hatiye û çima heta niha li hev kirin negihîştiye encamê?

Di xalên peymanê de bi zelalî qale mafê gelê Kurd û pêkhateyan tê kir, lê di reşnivîsa destûrê ya desthilata demkî de navê Kurdan jî derbas nabe. Banga pirrengiyê di nava rêvebirina Welat de tê kirin, lê ji bilî HTŞ'ê û tunderewan di hikumeta veguhêz de tune. Qala agirbestê li tevahî herêmê hatibû kirin, lê him ji Dêrazorê û him jî li rojhilatê Helebê him rê li xelkên bakurê Sûriyê tên girtin û him jî taxên Kurdan ên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dem bi dem tên dorpêçkirin û xelkê wê rastî destdirêjiyê tê. Tevî van hemû binpêkirinan jî QSD'ê eşkere dike ku ew pabendî peymanê ne û yên xwe ji pêkanînê dûr digrin yên li Şamê ne.

Li gorî hin agahiyan, tê gotin ku bi rastî jî QSD'ê û serokê hikumeta veguhêz Ehmed El-Şerie bi navê xwe yê din Ebû Muhemed El-Colanî, di nava xwe de di hin mijaran de gihiştine encamê ku ew jî beşdariya QSD'ê bi sê firqeyan a di nava Artêşa Nû ya Sûriyê de. Ev mijar, yek ji mijarên girîng ên danûstandinê ye, lê gelek xalên hîn girîng hene ku divê pêk werin hene. Ew jî mijarên Îdarî û sazîbûnê ne. Her wiha Ewlehiya Hundurîn jî xala herî girînge ji bo herêmê da li hember hemû cure êrişan biparêzê.

Em qala lihevkirinê dikin lê aliyê Şamê daxwazê dike ku hêzên wan serbest derbasî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin û sazî û dezgehên xwe jî li ser navê xwe derbas bikin. Lê gelo di van şertûmercên heyî de çawa were qebûlkirin? Her kesî dît ku di 13'ê Kanûna 2025'an de 3 Amerîkî li Çolistana Sûriyê di êrişeke DAIŞ'ê de hatin kuştin ku ew kesê li ser navê DAIŞ'ê êriş kiribû, endamekî hêzên hikumeta Şamê bû ku navê Ewlehiya Giştî li xwe dikin. Ya mirov ji vê jî fêm dike ew e ku dixwazin di bin navê Ewlehiya giştî an jî navên din de rê ji xwe re vebikin da fermî li bakur û rojhilatê Sûriyê tevbigerin. Ji ber bi çalakiyan QSD'ê tevgera DAIŞ'ê hemû sînordar kiriye, wer xuyaye dixwazin bi vî rengî wekî Kurmê darê xwe berdin nava herêmê û ji hundur de xerab bikin. Lê her çiqasî QSD'ê di hin mijarên danûstandinê de nerm nêzêk dibe, ewqasî jî li aliyê din hişyare û dizane niyeta aliyan ji danûstandinê ne li hevkirine lê berovajî wê têkbirine. Lewma aliyên Navdewletî jî ku niha dixwazin baweriyê bidin Şamê û wê fermî nas bikin, di rastiyê de xwe nêzî DAIŞ'ê dikine û wekî li Palmîrayê êrişî hêzên Amerîkî hat kirin, ew ê hîne êriş zêdetir bibin.

Di dawiyê de dixwazim bibêjim ku QSD'ê ew hêze ku niha ew pîme ku rê li ber teqandina bombeya DAIŞ'ê girtiye û ger hîn zêde neyê destekkirin, ne dûre wekî 2014'an û 2015'an biteqe û li her derê belav bibe.

### Sudoku:Pirs 69

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 9 | | | 3 | | 6 | | |
| 7 | | | | | | 4 | | |
| | 3 | | 1 | 4 | 8 | | | |
| | | 3 | | 7 | 4 | 8 | | |
| | 7 | | 5 | | 1 | | 3 | |
| | | 4 | 3 | 9 | | 1 | | |
| | | | 9 | 6 | 3 | | 1 | |
| | | 7 | | | | | | 9 |
| | | 8 | | 5 | | | 6 | |

### Sudoku: Bersiv 68

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 3 | 2 | 7 | 8 | 6 | 9 | 1 | 4 |
| 1 | 7 | 9 | 3 | 4 | 5 | 8 | 6 | 2 |
| 4 | 8 | 6 | 9 | 2 | 1 | 3 | 5 | 7 |
| 2 | 1 | 7 | 6 | 9 | 3 | 5 | 4 | 8 |
| 8 | 9 | 5 | 4 | 1 | 2 | 7 | 3 | 6 |
| 3 | 6 | 4 | 5 | 7 | 8 | 1 | 2 | 9 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 6 | 7 | 4 | 8 | 3 |
| 6 | 4 | 3 | 8 | 5 | 9 | 2 | 7 | 1 |
| 7 | 2 | 8 | 1 | 3 | 4 | 6 | 9 | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Hetav bû sêl:**
- Bi heman wateyê.
(Hetav ango roj. Dema roj ber bi ava ve diçe weke sêla li ser êgir sor û girover dibe)

**Kûçik xwediyê xwe nas nake:**
- Hewa pir germ e.

**Lîstina pisîkê ye, mirina mişkê ye:**
- Ji bo hina keyf û seyran e, ji bo hina şîn û êşa giran e.

**Mirov tiliyan bixe çavê hev mirov hev nabîne:**
- Bi heman wateyê.

**Mû ji maran dibûn:**
- Pir sar bû.

**LI SER PARASTIN Û HAYDARIYÊ**

**Bila guhê te li ser be:**
- Hay jê hebe da tiştekî neke.
- Nehêle tiştek pê were; biparêze.

**Bi qorzîka çavê xwe li min binêre:**
- Bila haya te ji min hebe; bila siya te li ser min be.

**Çavek kor be mirov destê xwe dide ber yê din:**
- Dema mirov carekê zerer dît, divê ji bo careke din hay ji xwe hebe.

**Çavê min li ser e:**
- Di bin parastina min de ye; haya min jê heye; ez dişopînim.

**Çavê xwe jê girt:**
- Nexwest bibîne.

Da ber perê xwe/da bin perê xwe:
- Parast; nehişt tiştek pê were; hay jê ma.

**Destê min li ser e:**
- Di bin parastina min de ye; ez hay jê dimînim.

**Destê wî girtî ye:**
- Pereyên xwe, tiştên xwe di cihê wan de bi kar tîne; tiştên xwe diparêze.

**Destgirtî ye:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

---

## Cîhan Bilgîn; Şîrovekara rasteqîn a heqîqet û rastiyê bû

Hevreyên Cîhan Bilgîn diyar kirin ku şehîd Cîhan şîrovekara rasteqîn a heqîqet û rastiyê bû û gotin, "Rojnemevan Cîhan jineke pir dihat hezkirin, mirov jê hêz û moral digirt...**R-3**



## Paradîgma Netewa Demokratîk rêya tekane ya çareseriyê ye

Li hemberî hişmendiya netew-dewlet a ku desthilatdaran daye avakirin, Rêber Apo paradîgmeya Netewa Demokratîk "Demokrasî, Ekolojî û Azadiya Jinê" dide pêş. Ev paradîgma ne tenê ji bo gelê Kurd e, lê belê ji bo tevahî gelan e.**R-6**



## 'Ne bi êriş û pilanan, ne jî bi dorpêçê berxwedana 14 salan lawaz nabe'



Jinên Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dan zanîn ku hêza gelê ku li ser bîrdoziya Rêber Apo mezin bûye, wê li ber hemû polîtîkayên îradeşikandinê bisekine...**R-2**

## Çar tabaqayên bîrdoziya rizgariya jin



Rêber Apo nasnameyên jinan bi çar tabaqayan rave dike, çanda xwedawend, çanda jinên Qesrê, çanda Satî û çanda Jina Azad, ev çar tabaqa jî di birdoziya rizgariya jinê de mijarê lêkolînê ye...**R-10**

## 'Pêwîstî bi komxebatan heye da ku jêdereke bingehîn a rêzimanê çêbibe'

Mizgîn Hesen destnîşan kir ku zimanzan nikarin ziman û rêzimanê çêkin, lê belê ew ziman şîrove dikin û got, "Ziman berpirsiyariyeke, lewma pêwîst e komxebat ji bo amadekirina rêzimaneke bingehîn a Kurmancî bên lidarxistin."**R-9**

Rûnahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1335 | 21-Berfanbar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# RAGIHANDINA AZAD ÎRADEYA CIVAKA AZAD DIPARÊZE

Hevserokê Yekîtiya Ragihandina Azad Idrîs Henan diyar kir ku di pêvajoya aloziya Sûriyê ya serdemên her du desthilatdariyan de, Ragihandina Azad li hemberî aliyên dijberî projeya demokratîk dîwarek bû ku nekarin wê derbas bikin, lewra ew niha tê armancgirtin û şerekî taybet ê ragihandinê li dijî wê tê meşandin û got, "Ragihandina Azad îradeya civaka azad diparêze"**R-4**



## Mehmûd Qeremox: Bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê gel û şervanan Bendava Tişrînê parastin



Endamê Rêveberiya Meclisa Leşkerî ya kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku saleke pir dijwar û dagirtî li ser berxwedaniya Bendava Tişrînê re derbas bû, di vê berxwedanê de gelek berdelên giran hatin dayîn û got, "Bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê şervanên YPG- YPJ û gelê berxwedêr bendav parastin."**R-5**

## Koçberên Efrînê: Ji ber nebûna dibistanê zarokên me bê xwendin mane



Koçberên Efrîn ku li Focê Terteb ê nêzî bajarê Qamişlo bi cih bûne diyar kirin ku 53 zarokên wan ji refa 1-6'an ji ber nebûna dibistanê bê xwendin mane. Herwiha Koçberan bang li Desteya Perwerdeyê kir ku ji bo zarokên wan dibistanekê li wir ava bike.**R-7**



**Di 4 Qatmanan de Pênasekirina Nasnameya Jin** — İsyan Karadeniz — R-2



**Bê Komûn Çareserî Nabe!** — Sînan Cûdî — R-6



**Sala çû û ya nû** — Hafiz Ahmet Turhalli — R-7



**Hunera berxwedanê** — Remezan Olçen — R-9

# ‘Ne bi êriş û pilanan, ne jî bi dorpêçê berxwedana 14 salan lawaz nabe’

Jinên Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dan zanîn ku hêza gelê ku li ser bîrdoziya Rêber Apo mezin bûye, wê li ber hemû polîtîkayên îradeşikandinê bisekine. Herwiha tekez kirin ku di vê pêvajoyê de rêxistinbûna jin hîn xurtir bûye û bi banga Rêbertî re kar, hebûn û jiyana xwe li gor wê saz kirine.

**Esma Mistefa/Heleb**

Her du taxên biçûk yên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ku bi salne li hember hemû kiyarên dewletên komên çeteyan û pilanên navdewletî liber xwe didin, muhra xwe li dîroka gelên berxwedêr dane. Piştî hatina hikumeta veguhêz ya nû li ser desthilatdariyê, vê hikumetê jî ku ji Rêjîma Baas ne baştir bû, dest bi kiryar û polîtîkeyên xwe yên dijmirovî kirin. Ji ber her du taxan ji destpêka Şoreşa Rojava vex we parast û gelê wê têkoşîn kir, çavên hêzên derdor her tim li ser têkbirina wî berxwedaniyê bû. Lê belê tu carî ev berxwedanî û têkoşîn têk neçû ku niha jî bi heman îradeyê li ser polîtîkayên HTŞ’ê li ber xwe didin.

Tê zanîn ku ji demeke dirêj ve ji dema hikuemta veguhêz hatiye ser desthilatdariyê bi şêwazên cuda cuda tacîzan dide gelê taxê û dorpêçek hişk ferz kiriye. Têkildarî siyaseta dorpêçê, rewşa gel û bi taybet berxwedanî û rêxistinbûna ku ji aliyê jin ve tê kirin. Endama Meclisa Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Suad Hesen û Endama Nivîsgeha Perwerdê Gulisan Mistefa ji Rojnameya me re axivîn.

### ‘Di mijara Kurd de her kes bi zihniyeta têkbirina îradeyê nêz dibe’



Suad Hesen

Suad Hesen di destpêka axaftina xwe de ev bilêv kir: “Hêza gel li hember hemû cureyên êriş û pilanên derdor yên ku li ser her du taxan û bi tayebt li ser gelê Kurd dihate meşandin, sekinî. Di encama vê sekna bi rûmet de me dît ku gel hebûna xwe parast û heya niha jî li ser vê yekê bi îsrar berxwedaneke bê hempa dide meşandin. helbet ev yek xwe ji girêdanbûna gel ya bi felsefeya Rêber Apo re heye ku ji bo wan bû bingeha sazkirina jiyaneke bi têkoşîn û xweîsbatkirinê.

Em hemû dizanin ku her du taxên Kurdan yên Helebê niha di rewşeke cidî re derbas dibin, ev rewş yekser bandora xwe li ser gel dike lê belê tenê di aliyê jiyanî dike, di aliyê îradebûyînê de gel tevî sazî û rêxistinên xwe li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşger a ku ji 14 salan ve jiyanî dikin, hebûna xwe didomînin. Piştî rûxîna Rêjîma Baas helbet hêviyên me ji hikumeta heyî ne ev bû, lê belê ew jî dema mijar dibe gelê Kurd her kes xwe li ser pêkanîna berjewendiyên xwe û bi zihniyeta têkbirina îradeya vî gelî nêz dibe, ji lewra dorpêçeke dijî pîvanên mirovahiyê niha tê ferzkirin û di aliyê jiyanî de tiştekî derbasî her du taxan nakin.”



Gulisan Mistefa

### Asta xebatê wan hîn bilindtir dibe

Suad di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku îradeya jinên li taxê li hember siyasetên hatine meşandin, bû hêza tolhildanê û wiha got: “Ji kev in de rêxistinbûna gel û jin hebû. Bi rêxistinbûyîna xwe vî gelî hemû hewildanên dijmin têk birin û dorpêç jî bê bandor kirin û dikin. Niha rewşa taxê ne zêde baş e bi taybet di aliyê civakî de zehmetiyên cidî tên dîtin, dibe ku niha em xwe li ser lingan digrin lê belê ger rewş wiha dewam bike em ber bi zehmetiyên cidî ve diçin.

Lê belê divê em ji bîn nekin ji 14 salan ve çawa ku yekemîn komîna gel li vê taxê hate vekirin, heya niha jî di demên Rêjîma Essd, komên çekdaran û HTŞ’ê de jî ev rêxistinbûyîn nehatiye sekinandin. Niha jî rêxistinbûna taxê weke berê tê domandin, bi taybet jin di hundir vê rewşê de bi hatina Hikumeta Veguhêz re hîn zêdetir xwe birêxistin kir. Bi banga Rêber Apo re me hebûn, kar û jiyana xwe li gor wê saz kir, bi dehan perwerde û bi taybet li ser Manîfestoya Rêber Apo tên dayîn. Ev yek bi serê xwe şerkirin û têk birina polîtîkayên dorpêç û hwd in. Em xwedî rêxistibûna xwe ne, em ê li hember hemû polîtîke û pilanên dijmin li ber xwe bidin. Ger bi îmkanên herî kêm be jî, em ê jiyana xwe bidomînin.”

### Hêza jinên birêxistinkirî derdikeve holê

Her wiha Gulistan Mistefa destnîşan kir ku jinên birêxistinkirî û perwerdekirî wê bê bandor nebin û wiha pê de çû: “Di demên wiha de helbet dijmin dixwaze bi polîtîkeyên Şerê Taybet û bi her awayî, lîstokên xwe yên nerm bide meşandin. Herî zêde jî li ser jin ev yek tê pêkanîn. Ger em di ne ferqa van polîtîkeyan bin, wê zû bikaribin li ser me bandor ava bikin. Ji lewra yekbûyîn û hevgirtina hêza jin di van pêvajoyan de gelek girîng e. Helbet jinên ku bi şoreşê û bi taybet li ser bîrdoziya Rêber Abdullah Ocalan mezin bûne dikarin bikevin ferqa van polîkayan û li hember wan jî şer bikin. Niha rastiya ku di vir de tê meşandin, ev e.”



### Banga rakirina dorpêçê

Gulistan di dawiya axaftina xwe de ev got: “Zehmetî wê hebin, ji ber lîstokên hêzên herêmî û navneteweyî li ser me tên meşandin. Lê helbet hêviyên me ji hikumeta nû ne ev bû, em li bendê bûn ku Sûriye ber bi aştiyeke mayînde û aram ve biherikiya, lê mixabin ne gelê Ereb û ne jî hemû pêkhateyên din ji kiryaran dur nebûn. Li ser vê esasê jî em banga rakirina dorpêçê û bidawîkirina van siyasetên qirêj dikin. Hikumeta Veguhêz wê bi van nêzîkatiyan tu destkeftiyan û baweriyê bidest nexe.”

**Akademiya Jîneolojî**

### Di 4 Qatmanan de Pênasekirina Nasnameya Jin

İsyan Karadeniz

Rêber APO nasnameya jinê wiha pênase dike; Nasnameya jinê tene wek nasnameyekê cins girtina dest têrker nine û heqiqetê ifade nake. Ji ber ku nasnameya mirov bi civakbunê têşe digre. Li vir dû pirsên esasî derdikevê pêşi ya me. A yekemîn; nasname çi ye, ya din jî hebûn çi ye?

Di gerdunê de gellek zindî û hebûn hene. Lê di nava van hemû zindiyan de yê ku ji xwe re nasnameyan avadike, wê nasnameyê xwe di nava civakê de bi şewazên cûda cûda avadike mirov e. Ji ber vê civakbuyin ji bo me xwezayekî duyemin ava dike. Di keleka hebûna biyolojîk; hebunekê fîkrandinê, çand û her wekê din nasname tên avakirin. Hebûn heman hebune lê di derbarê vî hebunê de aliyên mitolojîk, olî, felsefî û bîrdozi nasname tê barkirin.

Minaka vî ya heri berbiçav ji nasnameya jinê ye.

Rêber Apo vê ya wek 4 tebeqa/Qatman bi nav kir. Wate ya vê jî ev e ku wek qalikekî her carê dema ku tû yekî radikî yeki din derdikevê pêşiya te. Tiştê ku dema li derva tû lê dinerê û hundirê vî de tiştên cuda derdikevê pêşiya te. Dema ku Rêber Apo vêya wek 4 qatman pênase kir; a yekemîn xwedawend, ya duyemîn çanda qesrê û jina malê, ya sêyemîn çanda satî û ya çaremîn jî wek nasnameya jina azad bi nav kir. Li vir hebuna jin heman hebun e lê nasnameya ku hatiye bar kirin diguherê. Minak nasnameya xwedawendîtî û çanda satî gellek ji hev cûda ye. Niha jî nasname û hebuna jinê gellek ji hev dur ketiye. Ji ber vê yekî pêdivî bi lêkolinekî arkeolojiya jin heye.

Rêber Apo name yê ku ji Jineolojî re şandiyê de jî bal kişand ser vê mijarê û got; ‘‘nasname û hebûna jin a di nava civakê de gelek ji hev dûr ketiye û gerek were nêzi hev kirin.’’

Nasnameya mirov nasnameyekê civakî ye. Gellek zindiyên di xwezayê de bi komî tevdigerin hene lê ev nayê wateya civakbunê. Komî tevgerina meşhingivan, pêzkoviyan û her wekî din ne wek civakbuna mirovan e. Cudabuyina mirov avakirina nirxên civakî yên exlaqî û politik de ye. Civaka yekem li derdora jin dayikê wekê şeweya klan xwe saz kiriye. Zarokên mirovan hetta 7-8 saliyê xwe pêwistiya xwe ya alikariye dibinî û her wiha mirov bi tenê xwe nikarî bijî, pêdiviya mirovan bi hevrebuyinê yanî civakbuyinê heye. Civaka yekem a bi navê klan de nasname û hebuna jinê di warê avakirin, rêxistin kirin û rêvebirina civakê de şekil digre. Ji ber vê zarokên ku çêdibin dayikê xwe nas dike, her wiha xwişk û birayên dayikê nas dike. Aliyê din de jî komên bi navê neçiriyê hene, lê şewaza klan behtir berfirehe û serkeftiye. Di dîrokê de bi vê awayî bi 2 şewazên ku mirovahî xwe li ser avakiriye hene. Bi hevsengiya fikrandina hestiyar û analitik, her wiha pêşketina ziman ve klan hin bêhtir pêşketin avadike.

Di vê pêvajoyê de mirov xwe û xwezayê wek hev dibîne û fikrandina mimetik ku tê wateya teqlit kirina xwezayê li ser mirov bi tesir e. Di gellek aliyan de jin û xweza deşibin hev û ev jî rolekî pîroz dide jin ê.



# Lêkolîneke zanistî: Salane bi hezaran çemên qeşayî winda dibin

Lêkolîneke zansitî ya nû nîşan dide ku eger germbûna avhewayî bê domandin bêyî tu kontrolkirinekê, wê di dehsalên li pêş me de li cîhanê bi hezaran çemên qeşayî winda bibin.

**Navenda Nûçeyan**

Lêkolîneke zanistî ya nû eşkere kir ku di dehsalên pêş de bi îhtîmaleke mezin ku salan e wê bi hezaran çemên qeşayî winda bibin, tenê beşeke sînorkirî jê wê di dawiya sedsala heyî de bimîne eger germbûna avhewayî bê domandin bêyî tu kontrolkirinekê.

Lêkolînê zelal kir ku pêşeroja van çeman bi awayekî rasterast girêdayê asta guhertina avhewayî ye.

Li gorî encaman hat zanîn ku siyasetên avhewayî wê diyar bike eger cîhanê wê nêzî 2 hezar çemên qeyaşî winda bike, an bighêje çar hezar çem di nîvê sedsala heyî de.

Lêkolîneran destnîşan kirin ku kêmkirina germbûnê bi pileyên kêm dibe ku cudahiyeke mezin çêbike di navbera parastina nêzî nîvê çemên qeşayî di sala 2100’an, an jî vegera wê kêmî ji sedî 10 ji hejmara heyî.

Kovara “Nature Climate Change” encamên lêkolîna ku ji hêla pisporê cîhana qeşê Lander van Tricht ve hatiye birêvebirin weşand, piştrast kir ku daneyên zanistî yên hatine bidestxistin pêwîstiya lezgîn a pejirandina pabendbûna polîtîkayên avhewayê yên bêtir; destnîşan dikin.

Lêkolîner bi gelemperî li ser mezinahiya girseya qeşayê û rûbera giştî ya çemên qeşayên mezin ên cîhanê disekinin, lê Van Tricht û tîma wî ya lêkolînê rêbazek cûda girtin, bi texmînkirina hejmara çemên qeşayên takekesî yên ku dibe ku di vê sedsalê de salan e winda bibin.

Lêkolîneran diyar kirin ku her çend helîna çemên biçûk ji helîna çemên mezin kêmtir beşdarî bilindbûna asta deryayê dibe jî, windabûna wan dikare bandorên neyînî yên berfireh li ser geştiyariyê an jî çandên herêmî bike.

Van Tricht ji Peymangeha Teknolojiyê ya Federal a Swîsreyê li Zurîhê û Zanîngeha Azad a Brukselê, di daxuyaniyek çapemeniyê de got ku windabûna her çemeke qeşayê bi serê xwe dikare bandorên giring ên herêmî çêbike, her çend mîqdara ava ku ji helîna wê çêdibe sînordar be jî.



Zanyaran di lêkolînên xwe de xwe dispêrin analîzkirina daneyên ku 211 hezar û 490 çemên qeşayî dihewînin, ku ji wêneyên satelîtê yên di nav databasa gerdûnî de hatine derxistin, bi armanca destnîşankirina sala ku cîhan dê windabûna hejmareke mezin ji çemên qeşayî bibîne, ku wan ev yek wekî “lûtkeya tunebûna çemên qeşa” bi nav kir.

Tîmê modelên komputerê yên taybet bikar anîn da ku şert û mercên qeşayê di bin gelek sînaryoyên germbûnê de simul bikin, ji bilindbûna 1.5 pileya Celsius li gorî astên berî şoreşa pîşesaziyê bigire heya sînaryoyek bi bilindbûna 4 pileya Celsius.

Cîhan niha salane bi qasî 1000 çemên qeşayî winda dike, lê lêkolînê hişyarî da ku ev rêje di salên pêş de dê gelektir bibe. Li gorî encaman, hejmara çemên qeşayî ku salan e winda dibin dê heta sala 2041’an bigihêje dora 2000’an, her çend germbûn bi 1,5 pileya Celsius ve sînordar be jî, ev pileya ku welatan di çarçoveya Peymana Avhewayê ya Parîsê de soz dane pabendî wê bin.

Li gorî vê sînaryoyê, heta sala 2100’an li cîhanê dê bi qasî 95 hezar û 957 çemên qeşayî, kêmtir ji nîvê hejmara niha ye; binîme. Lêbelê, Neteweyên Yekbûyî hişyarî da ku rêça niha ya germbûna gerdûnî dikare di çend salên pêş de ji sînorê 1.5°C derbas bibe.

Li gorî texmînan germahî di bin polîtîkayên hikûmetê yên heyî de bi 2,7 pileya Celsius dê zêde bibe, di navbera salên 2040 û 2060’î de dibe ku salane nêzîkî 3,000 çemên qeşayî winda bibin.

Heta sala 2100’an, di cîhaneke ku germahiya wê 2,7°C zêde dibe de, ji her pênc çemên qeşayî tenê yek dê bimîne, bi qasî 43 hezar û 852 çemê di cîhanê de. Di sînaryoya herî xirab de, bi zêdebûna 4°C, heta nîvê salên 2050’î salane heta 4,000 çemê dibe ku winda bibin. Li gorî lêkolînê heta dawiya sedsalê, tenê ji sedî 9 ji çemên qeşayên cîhanê wê bimînin, tenê 18 hezar û 288 çem dê bimîne.

# Yewnanistanê moşekên SPIKE li giravên Egeyê bi cih dike

**Navenda Nûçeyan**

**Yewnanistan moşekên ji Îsraîlê kirîn ên bi navê SPIKE li herêma Evros û giravên rojhilatê Egeyê bi cih dike. Çav li rê ye ku heta havîna pêşiya me pergala SPIKE bigihîje asta operasyonel.**

Dubendî û rikeberiya di navbera Tirkiye û Yewnanistan-Qibrisê de bi tevlêbûna Îsraîlê derket asta herî jor. Tifaqa li Ege û rojhilatê Deryaya Egeyê di navbera Yewnanistan, Îsraîl û Qibrisê li ser çavkaniyên binav ên deryayî pêk hatî hindî diçe vedigere tifaqek leşkerî ya dijberî Tirkiyeyê. Di vê çarçoveyê de meha borî tifaqê ragihandibû ku di aliyê pergalên sektora şer de jî peymanên nû çêkirine û Yewnanistanê çekên parastin û êrîşê yên bi navê SPIKE kirîne. Piştî vê nûçeyê îro Yewnanistanê ragihand ku pergala SPIKE li herêma Evros û giravên rojhilatê Egeyê ku dikeve ser sînorê peravî yê Tirkiyeyê bi cih dike. Pergala moşekên SPIKE ku heta 30 kîlometre hikmê wê heye, li hemberî hemû hedefên zirhî yên bejahî, hedefên di asta helîkopterên naqliye û taarûzê, navendên biryargeh û lojîstîkê bi bandor e.

### Yewnanistan kapasîteya leşkerî zêde dike

Rojnameya Kathîmerînî moşekên SPIKE di demek şerek de dikarin hêj keştiyên şer nêzîk peravê nebûyî ji holê rake. Her wiha hate daxuyandin ku perwerdehiya moşek û hemû alavên şer ên di çarçoveya pergala SPIKE de ji hêla Îsraîlê ve tê dayîn. Çav li rê ye ku ev pergal di demek kin de bi tedbîqatek berfireh bê ceribandin. Li gorî pisporên ewlehiyê Îsraîl hewil dide bi Yewnanistan û Qibrisê re li rojhilatê Deryaya Egeyê serweriya xwe bide avakirin û qabiliyeta tevgerê ya Tirkiyeyê bi sînor bike. Pispor dibêjin li gorî vê siyasetê bandora Tirkiyeyê ya li Sûriyê jî wê bi awayekê bê qels kirin.

### Hêza leşkerî ya hevpar ava kirin

Li gorî Kan Newsê jî Yewnanistan, Qibris û Îsraîlê hevkariya xwe derxistiye asta avakirina hêzek hevpar a leşkerî. Hate daxuyandin ku bi navê Hêza Destwerdana Lezgîn a di asta tûgayê de hatiye avakirin. Li gorî nûçeyê tê payîn ku hejmara tûgayê 1000 ji Îsraîlê, hezar ji Yewnanistanê û 500 jî ji Qibrisê bi giştî yekîneyek ji 2 hezar 500 leşkeran pêk tê, bê avakirin. Di nûçeyê de wiha hate gotin: “Çav li rê ye ku ev yekîne bikaribe binesaziya Hêzên Hewa û Deryayî yên li giravên Kerpe û Rodosê jî bikar bîne. Ev hêz di heman demê de dê xetên boriyên enerjiyê û qabloyên ceyranê yên binavê jî biparêze.




### Rojihaltê Deryaya Spî û Ege vala nayê hiştin

Pisporê Îsraîlî Shaî Gal diyar kir ku ev hêz ne li dijî dewletê lê ji bo dagirtine valahiyel stratejîk hatiye avakirin. Gal anî ziman ku li deverek Tirkiye mîna, “Welatê Şîn” bi nav dike platform û boriyên enerjiyê, qabloyên ceyranê bêparastin in û ne ev yek tê qebûlkirin û ne jî destûr tê dayîn ku hind dewlet bi xerîteyên nû rojhilatê Deryaya Spî û Egeyê bi rê ve bibin. Di nûçeyê de hate daxuyandin ku Serfermandarê Hêzên Hewayî yê Îsraîlê Tomer Bar, rayedarên payebilind ên Yewnanistan û Qibrisê ji bo vê mijarê hatin cem hev û hevkarî nixandin.

# Çar tabaqayên bîrdoziya rizgariya jinê

Rêber Apo nasnameyên jinan bi çar tabaqayan rave dike, çanda xwedawend, çanda jinên Qesrê, çanda Satî û çanda Jina Azad, ev çar tabaqa jî di birdoziya rizgariya jinê de mijarê lêkolînê ye, bi têgihştina van çandan jin xwe nas dike û ger xwe nas kir xwe azad jî dike.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Hertim dîrok wekî avahiyên maddî û çandan di warê wateya xwe de tê jiyîn. Ew nirxa jiyana civakî nîşan dide. Ji ber vê sedemê, Rêber Apo bi berdewamî xwest ku dîrok bi hişmendiyeke mezin bê xwendin, da ku têgihîştina rastiya civakî û xwezaya wê, Kokên pirsgirêkên civakî yên ku niha bûne krîz û civak bi wan re rû bi rû ne, bi taybetî pirsgirêka jinan ku çavkaniya hemû pirsgirêkên civakî ye.

### Dîrok ne tenê berhevokeke bûyerên berê ye

Pêwîst e dîrok bi awayekî rast were xwendin, wate û şîroveyên zanistî ji serdemên dîrokî û tiştên ku di wan de qewimîne baş û rast were nirxandin. Bê guman, xwendineke rast û baş a dîrokê dê bibe sedema encam û rastiyên kûr. Dîrok ne tenê berhevokeke bûyerên berê ye; ev nêzîkatiyek rûberî ye. Têgihîştina dîrokê divê sosyolojîk be. Ji ber vê yekê rêbaza me di nêzîkatiya dîroka jinan û têgeha arkolojiya jinan de nêzîkatiya dîrokî ya rêber eşkere dike.

### Hebûna civakî bi rêya jinan çêbûye

Heger em bi nêrîna jin li mijarê dîrokê mêyzebikin gelek tarîtî ronî dibin. Ji ber ku hebûna civakî ya mirovahiyê di seranserê dîrokê de bi rêya jinan çêbûye. Jin wekî hebûn û nasname ne tenê wekî hebûna biyolojîk lê di heman demê de wekî nasnameya çandî, rewşenbîrî û felsefî û wekî wate jî pêk hatiye. Rêber Apo nasnameyên van jinan bi çar tabaqayan rave dike. Ev çar tabaqa jî wekî birdoziya rizgariya jinê de mijarê lêkolînê destdigre. Çanda xwedawend, Çanda Jinên Qesrê, Çanda Satî û Çanda Jina Azad.

### Çanda Xwedawend

Mirov, hebûneke civakî ye. Gava mirov derketine holê, xwezaya civakî jî derketiye holê. Ev taybetmendiyek e ku wan ji hebûnên din ên zindî cuda dike. Her çend zindiyên wekî koman dijîn jî heye. Tiştê ku mirovan ji wan komankomikan cuda dike, bidestxistina civakbûyînê yê. Ev jî bi çend faktoran ve girêdayî ye. Bunya fîzyolojîk a mirovan bi awayekî pêş neketiye ku ew bikaribin mîna zindiyên din xwe biparêzin. Ji bilî diyardeya çêbûn û zayînê ku wî dixe bin barê mezinkirin, xwedîkirin û parastina zarok ji xetereyên nêzîk û yên ji derve. Ev civakbûn ji bi xwezayî derdora jin avadibe. Zarokek heya nebe 5 sal nikare jiyana xwe bidomîne, pêwistî bi dayîkê dibine, ji aliyê xwarin bigre heya parastinê.

Herwiha pêwistiya berdewamiya neslê xwe heye. Mirov civakê diafirîne û civak jî mirov diafirîne. Mirov bi avahiya mêjiyê xwe û organên din ên bingehîn hebûnek bi awayekî ecêb rêxistinkirî ye. Mêjî ramanê hildiberîne, raman hebûnê çêdike û binasname dike. Dema ku raman dest bi têgihîştina xwe dike, mirovahî dest bi rêwîtiya xwe ya dîtina rastî û heqiqatê dike. Rêber Apo vê xwezayê wekî xwezaya duyemîn an jî xwezaya civakî bi nav dike. Tê zanîn ku xwezaya civakî bandorek jinê heye, an jî bi vî rengî pêş dikeve

Civakbûyîn li dora jinan pêk tê û klana ku ji dayik, xal, xaltî û zarokan pêk tên ku hejmara wan di navbera 15 heya 30 kesan de ye. Klan tiştek e ku jin diafirîn e; ew civakê diparêzin, ava dikin û pêş dixin. Em behsa serdemek dikin ku vedigere 50,000 heya 70,000 sal berê.

### komên derdora jin-dayîk ava dibin û hemberê wê komên kujerê kastîk

Di dîrokê de du çemen dîrokî heye. Aliyekî de erîş, zordarî û desthilatdarî, ji aliyekîn de jî berxwedanî, ked û wekhevî hebû û heye. Komên ku avabûne û guhertina koman girêdayê diroka jine. Komên ku derdora jin avabûne heye, heman demê komên ku nêçîrvanî dikin jî hebûn. Komên ku erîşê nirxê civakî dikin heye. Rêbertî di manîfestoya Aşîtî û Demoqratîk de ev kom bi navê 'Kujerê Kastîk' bi nav dike. Yek armancê wan ku erişê nirx û keda civakê dikin.

Çawa aliyekî komên nêçirvan xwe rêxistin dikin, aliyekî de komên ku derdora jin-dayîk komdibin jî heye. Bi demê re ev klanên jin-dayîk pêş dikeve, xwe birêxistin dike û li ser bingehek siyasî û exlaqî ava dibe. Encamê erişên kujerên kastîk, komên derdora jin avadibin mecbur dibinin ku xwe biparêzin. Li ser vê esasî derbasî merhaleyek dîrokî ya nû dibin. Êdî niştecîh dibin. Mal û cihên xwe li ser esasê xweparastinê ava dikin. Bi şeweyekî din em dikarin bibêjin ku neolîtîk encamê erişên kujerên kastin ji bo xwe biparêzen çêdibe. Bi serdema neolîtîk ve êdî nasnameya jin de guhertin çêdibe. Wekî xwedavend tê bi navkirin.

Tiştê ku em bala xwe bidin serdema neolîtîk yek ji ev e ku çawa çanda jin-dayîk de bi navê pîrozbûn nasnameya 'xwedavend' ava dibe û perestgehên xwe çêdikin. Heman deme nasnameya zilamên serdest de jî guhertinên bi navê 'xweda' avadibe û perestgehên pir mezin avadibin. Tiştê balkeş jî eve ku herdû perestgeh nêzî hevdû ne. Perestgehên xwedevend bi navê 'ronahî' tên naskirin. Perestgehên xwedayan jî bi navê 'sipî'tên naskirin. Wekî roja me ya îro çawa 'qesra sipî' cihê desthilatdariyê ye. Di dîrokê de ji perestgehên sipî bûne cihê qirkirina jin û civakê. Îro, di her malbatekê de Enkiyek ( Enkîdo) heye ku keda jinê înkar dike û xwe li ser nirx û berhemên wê ava dike.

### Çanda Jinên Qesrê

Rêbazên lêkolînkirina dîroka jin de, çanda jinên qesrê fêmkirin û destgirtin mijarekî girîng e. Nasnameya jin de yek guhertinên esasî ya pêvajoyên derbasbûyinê ye. Yek ji êrişên li ser nirxên jinan guhertin û veguherînên li dijî perestgehan bûn. Armanca perestgehan ew bû ku jinên (rahibên) ku rêûresmên bi navê xwedawendê pêk tînin, xwe perwerde bikin û di çalakiyên ku dê xizmeta berjewendiyên civakê bikin de, pêşengiyê bikin. Rahibe, berpirsiyarê hilbijartin û perwerdekirina rêberên ku dê civakê bi rê ve bibin bûn. Ew kesên ku di desthilatdariyê de rê û rêbazên ku ji hêla rahîbeyan ve di perestgehan de dihatin bikaranîn kopî kirin, di bin sernavê ''rahîp-kral" de perestgeh ava kirin. Armanca sereke ya êrişên li ser perestgehan, hilweşandina pergala jinan bû. Qesr, harem û cariyetî di rastiyê de, encama êrişên li ser perestgehan e. Di bingeh de ew çîroka kolekirin, girtin û Hepskirina jinan e. Rola jinan di qesrê de hatiye diyarkirin. Dervê wê derketin qedexeye. Erka jinan ew e ku bi zilamên aristokrat re xwe amadebikin û zarokan bînin. Heman deme ji bo berjewendiyên desthilatdarî kar bikin. Di nav pêşbirka zilamên serdest bibin amûrek hêsan û heya dawî hemû zextan qebûl bikin. Gor pergala qesrê harem heye û cariye heye. Hemû perwerdeyên taybet ji bo pergalê dibinin. Di nav jinan de tabaqa heye. Rolên dayika kral, Siltan û Haseke siltan ji hev cuda ne, her tişt jî aîdê krale.

Dema em pêvajoyên qesran dinirxînin, dibinin ku jinên hareme di encamên şeran de tên kirîn û fîrotin. Jin ji bo berfirehkirina desthilatdariya padîşah, bidawîanîna şeran, parastina desthilatdariyê û ji bo armancên siyasî û dîplomatîk




têne bikar anîn. Di pergala qesrê de çiqasî jinên ku xizmeta desthîlatdarî dikin hebe jî, avqas hewildanên berxwedana çanda xwedavend jî hatiye meşandin.

Ola yekxwedayî di koletiya jinan de li qesrê roleke mezin lîst û tewratê bandoreke girîng li ser koletiya jinan kir. Di gelek qanûnên dîrokî de ji em dibînin ku edî pergala li qesrê tê meşandin, li malê tê ferz kirin. Heman demê her malekî de jinek rola cariye digre û gor wê teşe digre. Qanûna Urukagina wiha hatiye nivîsandin: Jin edî tenê bi yek zilam re dikare bizewice. An jî qanêna Hammurabî de wiha hatiye nivîsandin: Ger deynê zilamekî hebe dikare jina xwe bifroşe ji ber ku jin mîlkê zilame. Dikare bikire û bîfroşe. Îro jî çanda qesrê di her mal û her saziyekê de heye. Di malbatê de serokê malê heye. Di saziyên dewletê de qanûn hene; di civakê de adet û kevneşopî hene. Jin hîn jî di şer û pevçûnan de tên kirîn û firotin. Qetilkirina wan bi navê rûmet û kevneşopiyê tê rewakirin; ew wekî kelûpel, tiştên cinsî û makîneyên zarokanînê têne dîtin. Zayîna kurekî hîn jî wekî bereket tê hesibandin, lê zayîna keçekê wekî bêbextî tê dîtin. Tekane tiştê ku em dikarin di jiyana xwe ya rojane de hîs bikin û şahidiya wê bikin, berdewamiya çanda qesra mezin e. Lê niha di nav malên biçûk de tê dîtin.

### Çanda Satî

Çanda satî, çandekî ku dema zîlamekî jiyana xwe dest dide, jin jî mecbur dimîne bi wî re were şewîtandin. Çanda Satî ne tenê mijarekî ku li Hîndistanê tê meşandin. Lê ew erişekî li ser hebûn û nasnameya jinê ye. Rêber Apo di parazname heya hevdîtinên xwe de, nirxandin li ser esasê 'çanda tewacûzê' dike. Çanda tecawûze bigîştî erişekî li ser nirxê jin û hebûna wê ye. Dema em mijarê Satî destdigrin dibîninin ku 'hebûna jin bi tevahî ji bo hebûna zilam tê teşegirtin.' Ev çand çiqasî bi Hîndistan re tê zanin jî, lê li gelek welatan bi rêbazên cur be cur tê meşandin. Ji bo wê girînge ku jin bikaribe hebûna xwe bi xwe ava bike û bibe ya xwe. Ger jin bi van bihizire û bikeve ferqa wan de, wê bikaribe bibe hêza çareseriyê, ji ber fêmkirin gava yekemîn ya pêkanînê ye.

### Çanda Jina Azad

Çanda jina azad ew e ku jin nasnameya xwe bi hebûn û xwebûn re teşe girtiye û li gorî wê tevdigere. Dema em pênaseya nasnameya jina azad dikin, beriya hertiştî pêwîst e jin bizanibe ku li kuderê û çawa wenda kir heman demê ferqa zanebûn û hêza xwe de ye. Ji ber ku jina azad dizane li kur çawa berxwe bide û rêya çareserî ava bike. Ev taybetmendiya bingehîn a jina azad e.

Dema em dibêjin çand jî tîşta ku bi hest, zanebûn û bi têkoşînê re domdar e. Rêber Apo di parêznameya Rojhilata Navîn de wiha dinirxîne: Te çi, li kur wenda kiriye, li vir bigere. Nasnameya jina azad ferqa wê tiştê de ye ku wendabûyina wê li ser vê axê çêbûye. Rêbazên çareseriyê bi nirxên civaka exlaqî û polîtîk ve ava dike. Pêşengtiya civak û bare şoreşa jin ya duyemîn re ked dide ye. Ji bo nasnameya jina azad fêmbikin, pênaseya sosyalîzm nîqaş bikin. Jina sosyalîst kî ye? Jinek sosyalîst çawa jiyan dike? Ev pirs dibe bingeha esasî ya fêmkirina dîroka jin.

Beriya hertîştê pêwîstî heye ku em ji xwe destpêbikin. Rêber Apo di nirxandineke xwe de wiha dibêje: "Teoriyek min heye. Hûn xwediyê hemû çandan in. Ji %25 çanda xwedavend ji %25 çanda jinên qesrê ji %25 çanda satî ji %25 ji çanda jina azad heye. Ger derfeta min hebûya min îdeolojîk çar tabaqayên bîrdoziya rizgariya jin binvîsan de. Niha jî ev projeya nîvçomayî bi Jineolojî berdewam dike.



# Cîhan Bilgîn; Şîrovekara rasteqîn a heqîqet û rastiyê bû

Hevreyên Cîhan Bilgîn diyar kirin ku şehîd Cîhan şîrovekara rasteqîn a heqîqet û rastiyê bû û gotin, "Rojnemevan Cîhan jineke pir dihat hezkirin û mirov jê hêz û moral digirt, herwiha ji bo derxistina kiryar û sûcên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê heya beriya şehadeta xwe li Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaxê dîmen, wêne û nûçe ji tevahî cîhanê re radighand.

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Cîhan Bîlgîn di sala 1996'an li navçeya Midyad a bajarê Mêrdînê yê Bakurê Kurdistanê hatibû dinê, di xwendina xwwe de beşa Hiqûqê ya Zanîngeha Dîcleyê de li Amedê xwendiye. Di heman demê de di çapemeniyê de xebat kiriye. Ji 2017`an de heya şehadetê jî nûçegihana Ajansa ANHA`yê bû, Di 19'ê Kanûna 2024`an de dema ku rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan rewşa êrişên giran ên li bendava Tişrînê dişopandin, bûn hedefa balafireke dewleta Tirkiyê ya bêmirov û di êrişê de gihîştin asta şehadetê.

Têkildarî kesayet, jiyan û têkoşîna Rojnemevan Cîhan Bilgîn, rojnemevan Şîlan Semîr û Argêş Viyan ku hevrêyên Cîhan Bîlgîn bûn, ji Rojnameya me re axivîn.

### 'Rojnemevan Cîhan gelek girêdayi kar û felsefeya Rêber Apo bû'

Argêş Viyan da zanîn ku Rojnemevan Cîhan Bilgîn di jiyanê de wêrek û bi xwediyê disiplîna cewherî bû û wiha anî ziman: "Di serî de, salvegera şahadeta rojnamevan Cîhan Bilgîn û Nazim Daştan ya yekemîn û hemû şehîdên berxwedaniya Bendava Tişrîn û şehîdên Çapemeniya Azad bi bîrtînin. Min Rojnemevan Cîhan Bilgîn bi derbasbûna karê ragihandinê naskir. Beriya wê jî gelek caran ez rastî dosya û hevpeyvînên Rojnemevana Cîhan hatibûm. Ya rastî pewist nedikir ji bo tu bikare peywendîyê li cem Rojnemevan Cîhan danê ku ji bo tu wê Rojnemevanê nêz ve nasbik e. Ji xwe Rojnemevan Cihan dema nêzî mirovan dibû te fêm dikir ku muhre xwe di wê civatê da datanî. Ji ber ku Rojnemevantiya wê pir bi dil û xwezayi bû. Di heman demê de ji dil bûna wê bandora li ser kar û xebata wê ya rêxistinî jî dikir. Rojnemevan Cîhan gelek girêdayi karê xwe û felsefeya Rêber Apo ya azadiya jin bû. Her dixwest xwe di fikir û ramanên Rêber Apo û azadiya zayenda jin de, di her bernam û nûçeyên ku pêşkêşiya Rojnemevan Cîhan bihata meşandin, te ew ezmûn di naverokê de di dît. Ji ber ku ewqas di jiyanê de wêrek û xwedî disiplîna cewherî bû. Rojnemevanên derdora rojnemevan Cîhan, bi navê Jiyan bang dikirin. Ruxmî ku me bi aliyê demijmêr de pir bi Rojnemevan Cîhan re jiyan nekir, lê di aliyê pîşeyî û jiyanî de gelek ezmûn Rojnemevan Cîhan Bîlgîn girt. Rojnemevan Cîhan temenê wê ne zêde mezin bû, lê pir xwe pêşxistibû. Rojnemevan di malê de beşa amadeyî zagonsazî xwendibû. Piştî derbasî qada şoreşa Rojava dibe, Rojnemevanên weke rojnamevan Seyîd Evran û Rojnemevanên din nasdike, Ajansa Hawarê de, weke rojnamevanekê şer kar dike û xwe pêş dixe. Gelek êrişên dewleta Tirk ya dagirker ji bo belge bike û di heman demê de jî pêşketin û deskeftiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bigihîne raya giştî bê ku paş de gav bavêje, heya demên dawiyê ked da û bû dengê rastiya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê."

### 'Cîhan Bilgîn karîbû bibe dengê heqîqetî'

Argêş diyar kir ku Rojnemevan Cîhan Bilgîn bi wêrekî û fedayîbûna Apoyî kirîbû bibe dengê rastî û heqîqetê û wiha pê de çû: "Bi rastî ji bo jiyana Rojnemevanên weke Cîhan Bilgîn pênase bike, pewîst e mirov lêhûrbunekê xurt bike. Ji ber ku ti peyv û hevok pakrewaniya wan Rojnemevanan nikare rast bide şîrove kirin. Ji ber ku bi pênûs û kamîraya Rojnemevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan ji raya giştî re kiryar û êrişên dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wan ragihandin. Di sala 2019'an de destpêka êrişên çeteyên DAIŞ'ê ya li bajarê Dêrezorê kêlî bi kêlî şopand û raya giştî re da ragihandin. Gelek caran di kêliyên êrişên dewleta Tirk ya dagirker re rû bû rû dima, lê dîsa jî gav paş de ne diavêt. Gelek caran di beşa Jineolojî dosyayên taybet çêdikir û plansaziyên wê yên rojên pêş gelek bûn. Ji ber ku Rojnemevanên derdora wê taybet rojnemavanên jin wêrekî û hêza Rojnemevan Cîhan di dîtin pir bi bandor dibûn. Gelek Rojnemevanên nû û ciwan yên qada ragihandinê de kar û xebat dimeşandin bi ezmûnên Rojnemevan Cîhan xwe pêş dixistin. Ji ber ku bi wêrekî û fedayîbûna Apoyî Rojnemevan Cîhan kirêbû bibe dengê rastî û heqîqetê.

### 'Cîhan Bilgîn bi esrar derbasî berxwedaniya Bendava Tişrînê bû'

Argêş Viyan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Li pêş çavê hemû cîhanê dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên hov yên girêdayî wan hewildan kirin ku qirkirin û komkûjiyekê mezin li ser gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê



Argêş Viyan



Şîlan Semîr

de bimeşînin. Gelek herêmên Rojavayê Kurdistanê êrişên hemdem dan destpêkir in. Şervanên QSD, YPJ û welatiyên ku hemû pêkhateyan pêktên, ji 7 salî heya 70'ê salî di 24 demijmêran têkoşîn û berxwedanî dikirin. Yek ji wan qadên ku dibûn şahidê berxwedena Bendava Şehîdan û Pêra Qereqozeqê xebatkarên Ragihandina Azad bûn. Hîna destpêka êrişên çeteyên dewleta Tirk ya dagirker li ser Minbicê hebû Rojnemevan Cîhan xwe pêşniyar kir ku biçe kiryar û berxwedaniya gelan nêz ve bişopîn e. Rûxmî ku Rojnemevanan ne dixwest Rojnemevan Cîhan biçe jî, dîsa bi xwasteka xwe derbasî qadên berxwedanê bû. Ne tenê dişopand, di heman demê de gelek sazî û dezgehên ragihandindina azad re dibû alîkar. Bi hevpeyvîn û nûçeyên xwe yên di Bendava Tişrînê Cîhan Bilgîn û Nazim Daştan bûn dengê berxwedena şervan û gelên tekoşer."

### 'Armanca dagirkeriya Tirk denê berxwedan û rastiyê qut bike'


Rojnemevan Argêş Viyan di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Armanca dewleta Tirk a dagirker ya bingehîn dengê berxwedanî û rastiyê qut bike. Ji ber ku ne cara yekem bû ku Rojnemevan û endamên qada çapemenî û ragihandinê tên armancgirtin. Rojnemevan Ezîz Koyluoglu, Gulistan Tara Hero Bahadîn û herî dawî jî Nazim Daştan, Cîhan Bilgîn û Egîd Roj hatin şehîd xistin. Ew şahadet çiqasî xemgînî xistibe di nav dilê Rojnemevanan de jî, lê hêz û wêrekiya wan Rojnemevanan jî gelek serkeftin çawa her di qada şoreşê hatibû destxistin, bandore xwe li qada ragihandina şoreşê jî kir. Ji ber wan Rojnemevanan tenê ne nûçe û buyer dişopandin, ew Rojnemevan şîrovekarê rasteqîn yên heqîqet û rastiyê bûn. Em jî weke rêhavelên wan yên têkoşîn û xebata ragihandinê, em soz didin wan Rojnemevanan kamîra û pênûsa wan ti caran erdê nahêlin."

### 'Ez niha xwe yek ji berhemê şehîd Cîhan dibînim'

di heman demê de Rojnemevan Şîlan Semîr diyar kir ku şehîd Cîhan Bilgîn hezkirin û girêdana wan a jiyanê zêde kir û wiha domand: "Min li navenda ragihandinê ya ajnsa ANHA Şehîd jiyan naskir. Dema ku min şehîd Cîhan naskir di danûstendina wê de min zehmetî nekişand, ji ber kesayeteke dilnizim bû û dev Ken bû, ji ber vê yekê şehîd Cîhan giringî di da min da ku ez ji nû xwe ava bikim, ji wê demê heta niha ez di kesayeta xwe de pir guhertinê dibînim, ev hemî jî bi saya şehîd Cîhan bû ku di kesayeta min de îrade, hezkirina jiyanê û girêdana bi kar re çêkir, ji ber vê yekê ez xwe berhemê keda şehîd Cîhan dibînim. Her wiha şehîd Cîhan di karê xwe yê ragihandinê di pir cidî bû, dispilîna wê pir zêde bû, dema ku bûyerek diqewimî li cihê bûyerê amade bû û li hember şehadetê bê tirs bû.

### 'Şehîd Cêhan her di qada şer û cengê de cih digrt'

Rojnemevan Şîlan Semîr di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Şehîd Cîhan berpirsyarîyek dîrokî girti bû li ser milê xwe, bi hestê jineke ciwan bûyerên ku li rojava di qewimîn di dema wê de di da raya giştî, her dem dixwest di qada çengê ya germ de be, hem rastiya qehremanî û lehengiya şervanê azadiyê û hem jî hovîtiya dewleta tirk ya bê sînor ku teknîka xwe ya pêşketî belavbike, bêyî ku ferq û cûdahiyê têxe nava leşker û sivîlan de, her der kiribû bêtê agir, Cîhan di xwest vê rastiyê zindî bi raya giştî re belavbike mînaka wê jî ev e; şehîd Cîhan her dem dixwest di çebheya peş de çih bigire lewra israr kir ku here bendava tişrînê û li wî cihê şer de dîmen û nûçeya belav dikir. Lewma zora dagirkeriya Tirk çû, nedixwest ew sûc û kiryarên wê derkevin pêş. Her dixwest ku van sûc û kiryarên dijmirovî li ber raya giştî bide veşartin. Ji ber vê yekê di 19 Kanûna 2024`an dagirkeriya Tirk li Bendava Tişrînê bi belafirên dijmirovî û hovane hevala me Cîhan Bilgîn û Nazim Daştin kir hedefa xwe û gihîtin asta Şehadetê, li vir xemgîniyek di dilê her kesî de hat avakirin, ji berk u her dû heval xwedî seknekî bi bandor bûn. Lê em ne rawistiya, berovajî wê me hîn zêdetir xwe xurt kir û ewe w xewin û xeyalên wan me girt li ser mile xwe."



# ‘Ragihandina Azad ji bo ragihandinên dijber dîwareke ku nikarin wê derbas bikin’

Hevserokê Yekîtiya Ragihandina Azad Idrîs Henan diyar kir ku di pêvajoya aloziya Sûriyê ya giştî ya serdemên her du desthilatdariyan de, yapiya Ragihandina Azad ji bo wan dîwarek bû ku nekarîn wê derbas bikin, lewra ev yapî niha tê armancgirtin û şerekî taybet ê ragihandinê tê meşandin û got, “Ragihandina Azad îradeya civaka azad diparêze.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê şerê taybet ê ku di rêya ragihandinên dijber li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê kirin, Hevserokê Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) Idrîs Henan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Sûriyê di qonaxeke dirêj a ji înkar û qirkirinê re derbas bû, herwiha di 8’ê Kanûna 2024’an de Sûrî derbasî qonaxeke nû bû, rewş bi çi rengî di nava van qonaxan re derbas bû û dibe?**

Piştî hilweşîna rejîma Baas li Sûriyê û qonaxa ku dehên salan dirêj kir ji înkar, operasyonên qirkirina nasnameya netewî ya giştî pêkhateyên Sûriyê, bi taybet nasnameya Kurd a netewî, hêvî hebû ew atmosfêra nû yan jî desthilatdariya nû ya ku bi serperştiya HTŞ’ê hatiye ser dika desthilatdariya Sûriyê, ew şert û mercên Baas afirandibû ku wan rewa bike, bihata guhertin û rê li ber azadiyeke wisa ku tu bi azadî nasnameya xwe vebêje, hatiba vekirin. Lê mixabin ew hêvî bi rojên destpêkê re li ber ba çûn. Ji ber desthilatdariya ku niha bicih kiriye, hewl da bi rêbazên Baasê lê bi cilên nû heman şêwaza wê bi awayekî hîn kirêtir berdewam bike. Lê peralelî wê yekê ji ber amatoriya desthilatdariyê, ew desthilatdariya hewl daye xwe bi rê û rêbazên medya djîtal rewa bike. Ji ber vê jî berê xwe daye heman rêbazê ku rewabûna xwe di tunekirina nasname û mezhebên dîtir de, dibîne. Lewra bi heman rêbaz û çekê êrişî nasnameyên pêkhate û mezhebên dîtir ên Sûriyê dike. Ev yek jî encax bi rêya xîtabekî dijadî, tijî kîn û nefretê ku gelan bîne berbamberî hev, sorkirin û tunehesbandinê bike, bikare pêk bîne. Ji bo wê bi awayekî pir bi rêk û pêk û birêxistinkirî, ev yek da meşandin û hewl da rewabûna xwe li ser vî bingehî bide avakirin.

Di ecamê de me dît li Beravê komkujî li dijî pêkhateya Elewî çêkirin û hewl dan wan komkujiyan di bin xîtabekî wisa de rewa bikin ku qetilkirin helalkirine. Lê bêhelwestî û bêdengiya civaka navdewletî û navnetewî ya li hemberî wan komkujiyan, rê û wêrekî da wan ku heman tecrûbê piştî çend mehan li Başûrê Sûriyê li dijî pêkhateya Durzî dûbare bikin. Lê li wir îradeyekî navdewletî hebû ku êdî destûrekî wisa nedinê, ji ber wê jî ew yek li wir têk çû, lê di encamê de komkujî hatin kirin. Dîsa jî hewl dan bi rêya heman xîtabê rewabûnê bidin, çiqas helwesta navnetewî tund an ne tund bû, lê hemû komkujî di bin wê sîwanê de hatin kirin.

**Ragihandinên dijber ên ku li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar dikin, xîtabekî kîn û nefretê didin meşandin, ew xîtab di kîjan astê de ye?**

Li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwestin bi heman xîtaba kîn û nefretê, lê bi astekî hîn tundtir û hovtir ji bo tunekirina statuya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya di şexsê Rêveberiya Xwesereya Demokratîk de ku ewqas e sal hatiye rûniştandin, bidin meşandin. Ji bo wê yekê jî piştgiriya odeyên şerê taybet ên dagirkeriya Tirk û elmandinê wê jî hebû, ji elmandinê bêtir reşkirineke hebû. Mixabin hinek platformên ragihandinê yên bibandor ji bo vê yekê derfet dane vekirin. Di heman demê tevî ku di pêvajoya danûstandinan de, piştî peymana 10’ê Adarê ya ku bi Fermandarê Giştî yên Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê Mezlûm Ebdî re hatiye îmzekirin. Tepkî, kiriyar û pratîka li ser erdê ya ragihandina fermî ya vê desthilatdariyê, eger tu bişopîne, tu dibîne tam berovajî soz û gotin ku bi rêveberiyê re tên kirin û dayîn e. Her tiştê ku vê rêveberiyê reş bike, tê meşandin.



Di bingehê xwe de ev xîtab dixwaze zemînekî komkujiyê, yan eger hat û êrişek çêbû, li gorî şert û mercên navnetewî yan herêmî ji bo wan guncaw bibin û karibin derfetê jî bibînin, wan komkujiyên xwe pêşwext de karasekî rewabûnê lê bikin. Hikumeta niha di destpêkê de berî komkujiyên Beravê û Başûrê Sûriyê ku hîna Beşar Eseed li Şamê bû, hewl dan li Şehbayê li dijî koçberên me yên Efrînê û neştecihên Şehbayê bi xwe jî komkujiyan pêk bînin. Lê mudaxeleya Rêveberiya Xweser, hêzên QSD’ê şert û mercên navnetewî ew rê neda, ji ber vê jî bi zorê koçberiyeke dîtir li wê herêmê çêbû.

**Çima bi taybetî li dijî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê şerekî ragihandinê heye, sedemên wê çi ne û Ragihandina Azad çawa li hemberî vê yekê disekin e?**

Ji ber li Bakur û Rojhilatê Sûriyê projeyeke demokratîk ku çareseriyê bi xwe re ji bo kirîza Sûriyê pêşkê dike heye. Herwiha ev çareserî kirîza Sûriyê jî derbas dike û ji bo herêma Rojhilata Navîn weke projeyeke demokratîk hatiye pratîzekirin. Di heman demê de ne tenê di asta tewrî de maye, lê di asta pratîkê de li ser erdê îro xwedî saziye ku bi sazî û dezgehan hatiye bigewdekirin. Hem jî ev proje, pralelî projeya navendîbûna hişk a ku dixwazin Sûriyê li ser şopên Baasê, lê hîn hişktir bidin avakirin e. Li bermaberî projeya navendîbûna hişk, projeya demokratîk tekane dergeha nefesê ji bo gelên Sûriyê yên aştîxwaz û demokrasîxwaz e. Lewra ew ji bo xwe vê proja Bakur û Rojhilatê Sûriyê, xeteriyekî dibînin ku di pratîzekirina proja demokratîk de, tunebûna xwe dibînin. Ji ber sîstema wan li ser bingehê navendiya hişk, pir dogma û li dora yek mezheb, netew û yek hizirê kom bûne û li ser bingehê wîlateyê hatine çêkirin. Lewra li dijî projeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî pir rêk û pêk asta xîtaba nefret û sorkirinê zêde bûye ku dixwazin ji bo wê zemînekî civakî yên netewperest û tundrew bidin avakirin, da ku karibin vê projeyê têk bibin.

Ev tablo diyare, beramberî wê ked û ezmûnekî bi salan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Rojavayê Kurdistanê ya Ragihandina Azad a Demokratîk heye û di berdêla wê de 31 rojnamevanan canê xwe li ser hîmê demokrasî, azadî û xwe gihandina heqîqetê feda kirine. Ev pêvajoya ku ji çekan wêdetir ragihandin pêşengtiyê wê dikê, êdî yapiyeke Ragihandina Azad beramberî wê xîtabê, xwe daye der. Niha li Siwêdayê ne ji Ragihandina Azad baya, dinyayê pê ne dizanî komkujî li wir hatiye kirin, her tişt hatibû tebsandin û kesekî mudaxeleyî wir nedikir, wê ev jî rê li ber komkujiyên hîn mezin vekiriba. Heman tişt li Berava Sûriyê, tekane alava ragihandinê derbasî wir bû, Ronahî TV bû yek ji stûnên yapiya ragihandina azad bû.

Di pêvajoya aloziya Sûriyê ya giştî de di serdemên her du desthilatdariyan de, yapiya Ragihandina Azad ji bo wan dîwarek bû ku nekarî derbas bikin, her diçû kiryar, dijatî, hîm û navendiya wan, dihatin eşkerekirin û hîn jî tê eşkerkirin. Ji bo wê niha ev yapî hatiye armancgirtin, ji ber ew dizanin yapiya destpêkê ya parastina projeya demokratîk, Ragihanda Azad e. Ev yek li herêmê jî belav bûye, niha li Bakurê Kurdistanê pêvajo heye, dîsa Ragihandina Azad pêşengtiya wê dike. Lewra dixwazin vê yapiyê xerab û derbas bikin. Di heman demê de di şexsê Ragihandina Azad de ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dixwazin aştiya Rojhilata Navîn têk bibin û li gorî zihniyet û sîstemên navendî yên hişk bidin avakirin.

**Rola Ragihandin Azad ji bo pêşîgirtina li ragihandinên dijber ên ku aramcên wan berovajîkirina heqîqetê ye, çi ye?**

Her endamekî ragihandina Azad xwedî wê misyonê ye ku weke şervanekî di çeperên destpêkê yên bervaniyê de, bi rol û mîsyonekî hîn zêdetir ji bo parastina vê statuya heyî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bilîz e. Ji ber endamên Ragihandina Azad xwedî mîsyonekî dîrokî, netewî û welat perweriyê ne. Ji ber vê jî niha ya herî girîng ew e ku endamên vê yapiyê bi girîngiya rola xwe bihisin. Encex ev yek bi xwedî derketina li mîsyonan, erkan, parastina nirxan, parastina xeta şehîdên Ragihandina Azad, meşa li ser şopa wan û bi hevkarî û pevgihandinê bi awayekî komînal bi hev re, weke eniyekî bervaniyê li hemberî van êrişan, bidin avakirin. Ragihandina Azad îradeya civaka azad e.






# ‘Pêwîstî bi komxebatan heye da ku jêdereke bingehîn a rêzimanê çêbibe’

Mizgîn Hesen destnîşan kir ku zimanzan nikarin ziman û rêzimanê çêkin, lê belê ew ziman şîrove dikin û got: “Ziman berpirsiyariyeke, lewma pêwîst e komxebat ji bo amadekirina rêzimaneke bingehîn a Kurmancî bên lidarxistin.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Rêzimana Kurdî ya Kurmancî yek ji girîngtirîn faktorên bipêşxistina zimanê Kurdî ye, li Rojavayê Kurdistanê tevî derfetên heyî jî ev qad nîvçe maye û roniya pirsa herî mezin li ser vê qadê heye.

Rêziman nêrînekê dide ka çawa zimanek dixebite, pirsgirêka nezelaliyê ya di axaftin û nivîsînê de çareser dike û bingehên fêrbûna zimanên din peyda dike, ew di qadên wêjeyî, zanistî, çandî û hwd … tê bikaranîn. Mamosteya zimannasiyê ya Beşa Wêjeya Kurdî ya Zanîngeha Rojava Mizgîn Hesen ku master di ziman û wêjeya Kurdî de wergirtiye ji rojnameya me re axivî.




**‘Zimanê devkî, zimanê Kurdî parast’**

Mizgînê diyar kir ku li Rojavayê Kurdistanê gel zimanê Kurdî parast û wiha anî ziman: “Ji Kovara Hawarê heya çalakiyên partiyên siyasî yên hînkirina Kurmancî li Rojavayê Kurdistanê hejmarek xebat bi kurmanciya nivîskî derketin û bi riya xebata siyasî zimanê Kurdî tevî ku di asteke kêm de bû jî lê dihat hînkirin. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava êdî fêrbûna zimanê Kurdî bû diyardeyek û roj bi roj bi pêş ket. Tişta ku hişt fêrkirina bi Kurdî ji Kurdan re hêsan bibe ew bû ku Kurd li Rojava bi Kurdî diaxivîn û nehatibûn helandin. Tevî ku zimanê perwerdeyî Erebî bû, lê gelê Kurd li malê û di nav civakê de bi zimanê xwe diaxivîn, vê yekê zimanê Kurdî parast. Dema ku şoreşê dest pê kir û derfet çêbûn, daxwaza fêrbûna xwendin û nivîsîna bi zimanê Kurdî zêdetir bû. Sê hêmanên sereke yên perwerdekirinê hene ew jî xwendekar minhac û mamoste ne. Li Rojava xwendekar hazir bûn, mamoste û rêbaz ne amade bûn, pirtûkên rêzman li vir tune bûn, parçebûna Kurdistanê jî xwedî bandor bû. Xebata mamosta Samî Tan ya Rêzimana Kurmancî û rêzeastên Hînkerê ku li Bakurê Kurdistanê hatibûn derxistin, li ber destê me bûn lewre me ew wekî meteryal bi kar anîn. Piştî ku zimanê Kurdî bû yek ji zimanên fermî yên Rêveberiya Xweser, Saziya Minhacan, peyman, zanîngeh … vebûn êdî rewş guherî, erdnîgarî fireh bû û pêwîstî bi ferheng, pirtûkine rêzimanê yên nû, xebatên zimannasiyê … çêbû.”

**‘Zimanzan ziman û rêzimanê çênakin, civak çêdike’**

Mamoste Mizgîn destnîşan kir ku zimanzan nikarin ziman û rêzimanan çêkin ji ber ziman sîstemeke arezûmendane (arbitraire) ye, lewre tişta ku civak bi kar bîne û were fêmkirin, ew rast e. Erkên zimannasan ew e ku ziman şirove bikin. Hemû zimanên cîhanê xwedî taybetmendî ne, her zimanek taybetmendî, rêzkirin, kêşana wî ji yê din cuda ye. Li Rojava mamoste Deham Ebdilfetah tenê xebatên rêzimanê amade kiribûn lê xebatên wî pir pisporî bûn (cînavk, navdêr û lêker) lewre pirtûkeke rêzimanê ku behsa hemû mijarên rêzimanê bike li Rojava nehatibû amadekirin. Sedemên neamadekirinê jî bi qedexekirina zimanê Kurdî yê nivîskî ve girêdayî bûn. Piştî ku Rêveberiya Xweser ava bû û erdnîgariya rêveberiyê fireh bû, hejmara karmendan zêde bû, Kurd, ereb û Suryan bi hev re di dezgehan de xebitîn, êdî zimanê pêwendiyê bû Erebî lewre hemû biryar, giştîname, arşîv … bi zimanê erebî dihatin derxistin ew jî ji ber ku hem Kurdan fêm dikir û hem jî siryanan fêm dikir, me dêhna xwe dayê ku hino hino zimanê Kurdî tê paşguhkirin û tenê wekî madeyeke teorî di hundirê refan de dimîne û di qadên fermî û civakî de kêm tê bikaranîn. Lewre me pêwîst dît ku Saziya Zimanê Kurdî ya ku heta 2019’an tenê bi karê hînkirina Kurmancî ve daketibû, erkê wê veguhere û asta bikaranîna Kurmancî bilind bike, devokan belge bike, ferhengan amade bike … Heta niha Rêzimana Kurmancî ya SZK’ê baştirîn xebat e ji nav rêzimanên kurmancî yên heyî ji ber ku vê pirtûkê gelek mijarên binakok ji hev derxistin, hem jî hin mijarên rêzimanî ji nû ve polîn kirin. Lê ji ber ku ev pirtûk ne li gor standara Kovara Hawarê, ragihandina Kurdî (Azadiya Welat û Med Tv) û heta em dikarin bibêjin a minhacên Rêveberiya Xweser jî bû lewre bû cihê rexneyê û pêkanîna wê nema bû mecbûrî. Eger ev berhem li ser hîmê standarda ku hatiye rûniştin, bihata amadekirin, tekez dê di asta herî yekem de bûya. Her çiqas nivîskarên vê pirtûkê standardeke din hilbijartine lê belê ew standard jî ne xerîb e û di nav kurdan de tê bikaranîn. Li ser asta Zanîngeha Rojava em Rêzimana Kurmancî ya SZK’ê weke çavkaniyeke sereke dibînin, ji ber ku di polînkirina mijarên rêzimanî de, di pêşkêşkirina mijara navdêr, cînavk, lêker, kêşan … de ji piraniya xebatên rêzimanî yên di destê me de baştir e.

**‘Rêzimana şîroveyî û rêzikparêzî’**

Mizgîn Hesen da zanîn ku rêzimana şîroveyî û ya rêzikparêzî hene û wiha domand: “ Romannivîs, helbestvan, wêjevan … dikarin rêzimana şiroveyî pêk bînin, nimûne nivîskarek ji Efrînê dikare li gor devoka xwe çîrokekê binivîsîne, her wiha dema ku çîrokên gelêrî tên belgekirin, kesê ku belgekirinê dike, dikare rêzimana wê çîroka gelêrî li gor devok û rêzimana ku dever, gund, herêm … bi kar tîne, wiha belge bike her wiha hin weşanxane bi taybet ên ku desteyeke wan a edîtoriyê hebe, dikarin li gor rêzimana şiroveyî, xebatan biweşînin. Lê kenalên televîzyonan ên fermî, minhacên dibistanan, weşan û semînerên zanîngehan û zimanê mamosteyan jî pêwîst e li gor rêzimana rêzikparêzî be ango li gor rêzimana ku bûye rê û resim û êdî her kes fêrî wî awayê nivîsê bûye. Ez dixwazim bibêjim ku ne her tişta ku tê bikaranîn jî rast e, mînak di kenalên me yên Kurdî de ku weşana wan bi piranî bi kurmancî ye, heta niha hin şaşiyên nivîskî û devkî derbas dibin, mînak: kenala Rojava TV dinivîse: Wan gotin, pêşeroj …û ya Ronahî TV dinivîse: Wan got, paşeroj … Dema em van cudahiyan dibînin em yekser têdigihêjin ku qutbûn di nav dezgehan de heye lewre ez bi rêya rojnameya we bangî kesên ku qada wan ziman e û karê ziman dikin ku tu heqê me nîne em gelê xwe bixin nav nakokiyê û wan şaş bikin lewre ji bo çareseriya van giriftan, pêwîst e her qadek di nav xwe de li ser şêweyekî zanistî yê bikaranîna ziman li hev bike.”

**‘Pêwîstî bi komxebatan heye da ku jêdereke bingehîn a rêziman çêbibe’**

Mizgîn Hesen tekez kir ku “Ziman berpirsiyariyeke mezin e, ew milkê her kesî ye, dema kesek biaxive, çawa diaxive, ew serbest e, em nikarin û nabe ku em hesaban ji kesekî bixwazin û bibîjin tu çima wiha dibêjî yan çima wiha nabêjî lê dema mijar dibe zimanê nivîskî, em neçar in li hev bicivin û bi nêrîneke hevbeş derkevin. Ji bo çareserkirina vê aloziyê, pêwîst e komxebatên serbixwe yên her qadekê çêbibin mînak qada perwerdeyê, ragihandin … û ew qad bi fikir û nêrînên xwe ve werin komxebateke giştî ku li ser asta Rojavayê be û Rojava jî bikare bi nêrîneke yekgirtî beşdarî komxebatên derveyî erdnîgariya Rojavayê bibe. Divê lihevkirineke giştî çêbibe da ku yên berheman bixwînin û li nûçeyan temaşe dikin, tevlihev nebin, ji ber ne ji mafê ekran, weşanxane û saziyan e ku tevlîheviyeke wiha ava bikin. Lewre ya baş ew e ku destpêkê di her saziyekê de û di her qadekê de komxebat werin lidarxistin û ew sazî bi nêrîna xwe ve tev li komxebata navendî bibin û li wir bigihêjin nêrîneke hevbeş ku her kes li gor wê nêrînê tev bigere. Divê şêweyê nivîsîn û bikaranîna ziman ne navendî be.”



## Hunera berxwedanê

**Remezan Olçen**

Huner di şertên zextê, şer û koçberiyê de ne tenê qadeke estetîk e, lê cihê berpirsyariyê, bîranînê û berxwedanê ye. Di vê çarçoveyê de huner wek amûreke vegotinê tê pênasekirin; amûreke ku çîrokên nedîtî, tepisandî û bêdengkirî nîşan dide. Huner bi vê wateyê ne şertê xweşwêneyî û xweşbêjiyê ye, lê şertê dewamkirina hebûnê ye. Berxwedan di pratîka hunerî de li vir bi awayekî fireh û kûr tê têgihiştin. Ew ne tenê rabûna li dijî şertan e û ne jî bi tenê rexnekirin e. Berxwedan israra li ser nîşandana ya ku nayê dîtin e; jinûve geşkirina çîrokên xwemalî yên civakê ne. Di vê nêzîkatiyê de huner ne “nerazîbûnek” e, lê şêweyekî dewamkirinê ye, peyamek ku dibêje hebûn hîn didome û çîrok hîn ne qediyaye.

Sembol di hunerê de rolêkî bingehîn dilîze. Sembol wek zimanekî veşartî tê bikaranîn, zimanek ku dema gotin bi rîsk be yan jî kêm bihêle, bi hêz derdikeve holê. Çivîkek, bedeneke birîndar, kulîlkek, darek, valahî an jî gerîlayeke jin hemû van nîşan û işaretan bi jiyan û çîrokê re têne girêdan. Sembol li vir parolaya jiyana di bin zextê de ye; ew bang dike ku ya ku nayê dîtin nîşan bide û bide xuyakirin û ya ku hatiye ji bîr kirin, jinûve bi bîr bîne. Vegotin û vegêrana gelê Kurd, zimanê bedenî yê kevneşop û şopên tejik û berikan di nav van sembolan de bi awayekî nûwaze têne xurtkirin, ne wek nostaljî, lê wek nîşandana dewama hebûnê.

Huner di navbera welat û dîasporayê de wek pirek tê afirandin. Li aliyekî wê gund, bajar, mal, hêlîn û çiya hene; li aliyekî din sirgûn, koçberî û hestê biyanîtiyê. Ev herdu cîhan di hunerê de wek hişên birîndar û berxwedêr têne hevgirtin. Huner li vir rêyekî derbasbûnê ye, xeteke ragihandinê ye û şertên civakî “di navberê de” bihêz dike. Ev rewş hunerê bi hişê kolektîf girêdide û afirandina hişê wek meseleya bingehîn datîne navenda jiyanê.

Di bin vê têgihiştinê de hunera kolektîf jî wateyekî girîng distîne. Kolektîfî ne tenê karkirina bi hev re ye, lê fikirandina bi hev re, parvekirina êş û berpirsyariyê ye. Di şertên zextê û sirgûnê de hunera kolektîf li dijî tenêtiyê tevneke piştevaniyê ye. Di vê tevnê de axaftin, nîqaş, parvekirin û bîranîn hene; ev hemû jî şertên xurtkirina hevdu ne.

Ziman di hunerê de ne tenê amûreke vegotin û vegêranê ye, lê nasname ye. Gotin, taybet bi zimanê dayikê, carna dikare hest û wateyên ku wêne bi tenê nikare bigihîne, bi xwe re bîne. Gotin û wêne hev temam dikin. Ziman li vir hem stargehek e hem jî amûreke berxwedanê ye; bêyî ziman huner bi têrkerî nikare di qada civakî de tesîrê bike.

Di encamê de huner wek karekî hiş û dilî tê pênasekirin. Huner çîrokên windabûyî, qedexebûyî û nedîtî wek şopên ku divê bên parastin û zindîkirin, hildide. Carna bibe kêlek, carna lênûskeke bîranînê, carna lorînek û carna jî aleke berxwedanê. Bi vî awayî huner ne tenê çalakiyek afirîner e, lê qadeke exlaqî, maleke bîranînê û stratejiyeke hêviyê ye—hêviyek ku bi bîranîna bi hev re û hilberîna kolektîf dikare çîrokên me ji tinebûnê rizgar bike.

# Sedemên kêmbûna hilberîna çandiniyê li Sûriyê, pirsgirêk û çareseriyên gengaz

Çandinî yek ji girîngtirîn sektora aborî li Sûriyê ye ku roleke girîng di dabînkirina xwarinê ji bo gel di heman demê de peydakirina derfetên kar; dilîze.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Sektora çandiniyê li Sûriyê yek ji stûnên herî girîng ên aboriya neteweyî ye, ji ber ku berî sala 2011'an nêzîkî ji sedî 20 ji hilberîna navxweyî ya giştî pêk dianî û ji bo beşek mezin ji gel debara jiyanê peyda dikir, di rêya hilbirîna zeviyên çandiniyê yên weke genim, pembû, zeytûn, ceh, nîsk, nok, garis û şewender.

Tevî pirsgirêkên ku sektora çandiniyê di salên dawî de pê re rû bi rû maye jî, lê berhemên herî girîng ên Sûriyê di piştgiriya aboriyê de roleke sereke dilîzin.

**Berhemên çandiniyê yên herî girîng li Sûriyeyê, beşdariya wan di aboriya neteweyî de û pirsgirêkên ku ev sektora girîng pê re rû bi rû ye:**

Çandinî li Sûriyê; danasîneke dîrokî Xaka Sûriyê yek ji kevintirîn herêmên çandiniyê yên cîhanê tê hesibandin, ku çandinî bi hezaran salan li herêmê hebû. Cotkarên Sûrî rêbazên çandiniyê yên cihêreng ên ku li gorî erdên cuda ên welêt guncaw in, bi kar tînin.

Di dehsalên borî de, sektora çandiniyê rêjeyek mezin ji hilbirîna herêmî ya giştî ya welat pêk anî. Tê texmînkirin ku çandinî di sala 1997'an de bi qasî ji sedî 29'ê ji hilbirîna herêmî ya giştî ya vê sektorê; bû. Ev sektor ne tenê çavkaniyek sereke ya dahatê ji bo welêt bû, lê di heman demê de nêzîkî ji sedî 40 hêza kar, hem li deverên gundewarî û hem jî li bajarî dixebitand.

**Berhemên çandiniyê yên herî giring li Sûriyê û bandora wan li ser aboriyê**

Genim

Berhema herî sereke li Sûriyê genim e û wekî çavkaniya sereke ya nan e, ku xwarineke bingehîn ji bo gelê Sûriyê ye. Sûriyê ji bo dabînkirina pêdiviyên xwarinê bi giranî xwe dispêre genim û piraniya hilberîna navxweyî li hundir tê xerckirin. Her çend Sûriyê di dehsalên berê de mîqdarên piçûk ên genim hinarde dikir jî, niha di nava aloziyê berdewam de ên ku welat tê de derbas dibe, hewl dide pêwîstiya xwe bidest bixe.

Herêmên berfireh ji axa Sûriyê bi genim tên çandin, bi taybetî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Hema, Humsê. Ev berhem yek ji bingehên sereke yên aboriya çandiniyê di welat de ye û bi awayekî mezin beşdarî dabînkirina



xwerinê ya gelê Sûriyê dike.

**2-Pembû li Sûriyê wekî giringtirîn berhema çandiniyê tê hesibandin**

Pembû yek ji giringtirîn berhemên dahatî li Sûriyê ye, ku li deverên avî tê çandin û çavkaniyek girîng a dahatê pêk tîne. Heta sala 1974'an, pembû sêyeka hinardekirina Sûriyê pêk dianî, bi qasî nîvê hilberînê di pîşesaziyên navxweyî de dihat bikaranîn û nîvê din jî dihat hinardekirin.

Pembû ji ber rola xwe di dabînkirina kar ji bo bi hezaran cotkaran de, herwiha ji ber dabînkirina pereyan ku Sûriyê bi rêya hinardekirina pembû ji bo bazarên navneteweyî hewce dike, xwedî girîngiyeke mezin a aborî ye.

**3-Zeytûn**

Sûriye yek ji mezintirîn hilberînerên zeytûnan li cîhanê ye, piştî Tunisê di cîhana Erebî de di rêza duyemîn de ye. Zeytûnên Sûrî bi kalîteya xwe ya bilind têne nasîn û ji bo gelek welatên cîhanê têne hinardekirin. Darên zeytûnê bi piranî li Efrîn û herêmên peravê û deverên hundir têne çandin.

Berhemanîna zeytûnan li Sûriyê beşek girîng ji sektora çandiniyê pêk tîne, ku gelek cotkarên li deverên gundewarî xwe dispêrin çandiniya zeytûnan. Wekî din, zeytûn ji bo hilberandina zeyta zeytûnê, ku xwarinek sereke ye û ji bo hinardekirinê tê bikar anîn.

Hêjayî gotinê ku bajarê Efrînê ku ya niha di bin dagirkeriya Tikriyê de ye cihê sereke yê hilbirîna zeytûnan e, rastî gelek binpêkirinan ji hêla çekdarên girêdayî dewleta Tirk tê, bi hezaran darên zeytûnan hatin birîn û ji bo derve hatin firton di heman demê de agir bi zeviyan xistin da ku demografiya herêmê bighurînin. Ev yek rasterast bandorê li ser aboriya herêmê dike û heya niha ev yek berdewam e, bêyî tu destwerdan ji hikumeta Sûriyê ya veguhêz.

**4-Ceh**

Ceh li Sûriyê çandiniyek girîng e, bi giranî li Bakur û Rojhiêatê Sûriyê û deverên hundir ên wekî Hema û Humsê tê çandin. Ew bi berfirehî di hilberîna xwarina ajalan de, herwiha di hilberîna hin hilberên xwarinê yên mîna nan de tê bikar anîn.

**5-Nok û nîsk**

Nok û nîsk li Sûriyê berhemên girîng ên kevneşopî ne, li gelek deverên welêt tên çandin û di sîstema xwarinê ya Sûriyê de bi giranî tên bikaranîn. Ev berhem çavkaniyek dewlemend û di xwarina gelê herêmê de roleke girîng dilîzin, nemaze di demên kêmbûna xwarinê de.

**Şewender Sikerî**

Şewender ji ber rola wê di hilberîna şekir de li Sûriyê çandiniyek girîng e. Ew bi giranî li herêmên bakurê welêt, bi taybetî li Heleb û Reqayê tê çandin. Şewender di pîşesaziya şekir a herêmî de tê bikar anîn, ku ew hilberek xwarinê ya sereke li bazara Sûriyê ye.

Pirsgirêkên ku li pêşiya sektora çandiniyê li Sûriyê derdikevin

Gelek pirsgirêk hene ku cotkar û bi giştî sektora çandiniyê pê re rû bi rû dimînin, jê:

1-Kêmbûna avê

Sûriyê welatekî ku kêmasiya wê ya avê heye, ku ev yek bandorek girîng li ser sektora çandiniyê dike. Cotkar bi giranî xwe dispêrin pergalên avdanê yên kevneşopî ku nebaş in, di encamê de ev yek baştirkirina hilberînê dijwar dike. Danasîna pergalên avdanê yên nûjen ên wekî avdana dilop ku hewceyî îstîsmarkirina mezin dike, dibe ku ji bo gelek cotkaran neyê peydakirin.

Ev zêdetirî deh salan e, li Sûriyê kêmbûneke berbiçav a baranê heye, ku bûye sedema kêmbûna qada çandiniya bi berhemên stratejîk ên wekî genim û ceh. Raporên Rêxistina Xurek û Çandiniyê (FAO) nîşan didin ku hişkesaliyê li hin herêman hilberîna çandiniyê bi rêjeya ji sedî 30-40kêm kiriye.

**Zirara ku gihaşt sîstemên avdanê û bendavan**

Ji ber şerê li Sûriyê ji sedî 50 zêdetir torên avdanê û bendavan wêran bûye, bi taybetî li Deşta Xab, Horan û kantona Cizîrê. Di heman demê de nakokiyên avê bi welatên ku av lê tê Sûriyê, bi taybetî Tirkiyê, jî beşdarî kêmkirina para Sûriyê ya Çemê Firatê bûne, ku rasterast bandor li kapasîteya avdanê kiriye. Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka kirîza Sûriyê ve, ji bo meşandina şerê avê û pêkanîna zextekê li ser gelê herêmê, ava çemê Firatê pir kêm kiriye, ev yek rasterast bandoreke xerab li çandiniyê kiriye.

**Zêdebûna nirxê sotemeniyê**

Ji ber kêmbûna baranê di salên borî de piraniya cotkaran ji bo avdana zeviyên xwe berê xwe didin avdana ji bîran, ev yek jî pêwîstiya wê bi sûtemniya ji bo xebitandina jînatoran heye, lê kêmbûna sûtemeniyê û bilindbûna nirxê wê bandoreke neyînî li reşa çandiniyê kiriye.

**Ziyanên berhevkirî di sektora çandiniyê de**

FAO mezinahiya windahiyên rasterast û nerasterast di sektora çandiniyê ya Sûriyê de di dema şer de bi qasî 16 milyar dolar texmîn kir, di nav de erdên çandiniyê, alav û koçberiya karkeran, ku bû sedema kêmbûna hilberînê û zêdebûna rêjeyên xizaniyê yên gundan.

**2-Pirsgirêkên ewlehî û siyasî**

Ji ber aloziya Sûriyê ya ku di sala 2011'an de dest pê kir, sektora çandiniyê ziyaneke mezin dît. Gelek erdên çandiniyê û binesaziya çandiniyê wêran bûn. Gelek cotkaran jî ji ber şer erdên xwe terikandin, ku bandorek neyînî li ser hilberîna çandiniyê kir.

**3-Kêmbûna piştgiriyê**

Di salên dawî de, piştgiriya hikûmetê ji bo cotkaran kêm bû, hem ji aliyê dabînkirina semadê û hem jî ji aliyê dermanên kêzikan ve. Ev yek bûye sedema kêmbûna berhemdariya erdên çandiniyê û zêdebûna lêçûnên hilberînê, ku bandor li ser qezencê kiriye.

**4- Guhertinên avhewayî**

Guherîna avhewayê li Sûriyê bûye gefek mezin ji bo sektora çandiniyê. Hişkesaliya demdirêj mîqdara ava berdest ji bo avdanê kêm dike, ku ev yek bandorê li berhemdariya çandiniyê dike.

**Çareseriyên gengaz ji bo zêdekirina hilberîna çandiniyê**

Ji bo bidestxistina çandiniyeke domdar li Sûriyeyê û zêdekirina rola berhemên çandiniyê yên herî giring ên Sûriyê di piştgiriya aboriyê de, divê hin gavên pratîkî bên avêtin da ku hilberînê baştir bibe.

1-Taşwîqkirina çandiniya domdar

Divê cotkar werin teşwîqkirin ku pratîkên çandiniya domdar ên ku ax û avê diparêzin, bi kar bînin.

2-Pêşxistina pergalên avdanê yên nûjen û bi bandor

Pêşvebirina bikaranîna avdana dilopî: Ji bo kêmkirina xerckirina avê heta %50, nemaze di çandiniyên berhemdar de.

Berhevkirina ava baranê: Avakirina xezan û terasan ji bo berhevkirina ava baranê li deverên ku baran lê tê avdan.

3-Baştirkirina rêveberiya çavkaniyên avê

Sererastkirina bendavên piçûk û navîn ji bo zêdekirina karîgeriya depokirina avê.

Kontrolkirina kêmbûna ava bin erdê bi rêya qanûnên hişk û teşwîqên ji bo pratîkên domdar.

4- Piştgiriya têketinên hilberînê

Pêşkêşkirina semad, tov û dermanên kêzikan bi bihayên kêm bi rêya saziyên dewletê ji bo kêmkirina girêdayîbûna bi bazara reş.

5- Baştirkirina bazarkirina berheman

Avakirina navendên hilanîna berhemên çandiniyê û pêşxistina rêbazên veguhastinê bi armanca kêmkirina windahiyên berheman.

Berhemên çandiniyê yên herî girîng li Sûriyeyê di piştgiriya aboriyê û dabînkirina xwarinê ji bo gel de roleke girîng dilîzin. Tevî pirsgirêkên ku sektora çandiniyê pê re rû bi rû ye, bi rêya pejirandina teknolojiyên nûjen û zêdekirina piştgiriyê derfetên girîng hene ku hilberînê baştir bikin. Ger bal were kişandin ser baştirkirina çandiniyê li Sûriyê, ev sektor dikare bi awayekî girîngtir beşdarî bidestxistina aramiya aborî û xweseriya xwarinê bibe.



# Mehmûd Qeremox: Bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê gel û şervanan Bendava Tişrînê parastin

Endamê Rêveberiya Meclisa Leşkerî ya kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku saleke pir dijwar û dagirtî li ser berxwedaniya Bendava Tişrînê re derbas bû, di vê berxwedanê de gelek berdelên giran hatin dayîn û got, "Bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê şervanên YPG-YPJ û gelê berxwedêr bendav parastin."

**Tekoşîn Amara/Firat**

Di 8'ê Kanûna 2024'an de bi hilweşandina rejîma Baas'ê re û hatina Hikûmeta veguhêz a Sûriyê re Bakûr-Rojhilatê Sûriyê û Sûriye di qonaxeke pir dijwar re derbas bûn, di nav alozî û qeyranan de berxwedaniyeke bê hempa ji aliyê gel û şervanan ve hat meşandin. Bi taybet berxwedaniya ku li bendava Tişrînê hat meşandin serkeftinên pir mezin bi xwe re anîn. Divî çarçoveyê de endamê Rêveberiya Meclîsa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox ji Rojnameya me re axivî.

**'Êrîşên li ser Bendava Tişrînê ji bo pêkanîna Xeyalên Osmaniya nû bûn'**

Mehmûd Qeremox di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Di kanûna 2024'an de bi hilweşandina rejîma Baas'ê re dewleta Tirk û çeteyên girêdayê wê li seranserê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê, BI taybet li Heleb, Şehba, Minbic, Pira qaraqozaxê û Bendava Tişrînê êrîşên xwe zêde kirin. Nıha Sûriye ber bi merheleyeke nû ve diçe, di dema Rejîma Baas'ê de jî qetlîam û talan hebûn, bi hatina hikumeta Veguhêz re jî alozî û şer berdewamin. Hatina hûkumeta veguhêz li ser desthilatdariya Sûriyê, bi desteka hêzên hegomon pêk hat. Daxwaza wan ew bû ku bi komployekê herêma Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dagir bikin da ku xeyalên xwe yên Osmaniya nû pêk bînin. Di êrîşên Derhafir, Minbic, Qaraqozax û Tişrînê de jî pir aşkere derket holê bi destekdayîna hegemon -dewleta Tirk û hevalbendên wî pêk hat."



**'Armanca êrîşan têkbirina projeya Netewa Demokratîk bû'**

Mehmûd Qeremox wiha behsa êrîşên hovane yên dewleta Tirk û hevalbendên wî kir û got" Armanca êrîşên dewleta Tirk ne tenê parçeyek ji axa Kurdistanê dagir bike, armanc ew e ku projeya netewa demokratîk ya ku bi salên dirêjin bê ferq û cûdahî gelên heremê ku bi çand, ziman û olên xwe bi hev re jiyan dikin, têk bibe, di heman demê de hevgirtina gelan Kurd, Ereb, Sûyan û Asûrî li pêşiya wan astengin. Dewleta Tirk û hevalbendên wê li Bendava Tişrînê û Pira qaraqozaxê dixwastin xeyalên xwe yên osmanî pêk bînin, lê bi berxwedaniya ku hat meşandin xeyalên wan yên osmanî têk çû. Hedefa wan ya êrîşan ew bû ku pêştî Şehba û Minbic hatin dagirkirin, bendava Tişrîn û Pira qaraqozaxê jî dagir bikin, da ku Bakûr û Rojhilatê Sûriyê û di heman demê de qada Rêveberiya Xweser dagir bikin û xeyalên xwe yên 15 salî yê Mîsaqî-Mîllî ku ji Helebê heta Mûsilê dagir bikin, pêk bîne."

**'Berxwedanîya gel û şervanan plana dagirkeriyê têk bir'**

Mehmûd Qeremox da zanîn ku di êrîşên hovane yên dewleta Tirk de gel û şervan mil bi mil parastina av, ax û enerjiya xwe kirin, li hemberê hemû êrîşên hovan e yên dewleta Tirk û hevalbendên wê, qehremaniyeke pir mezin hat meşandin û wiha anî ziman: "Şerê ku hat meşandin ne tenê şerê bendavekê bû şerê hebûn û tunebûnê bû. Dewleta Tirk bi teknîka xwe ya herê pêşketî ku pişta xwe pê rast kiribû, armanc dikir ku axa Bakûr- Rojhilatê Sûriyê dagir bike, bi berxwedaniya gel û şervanan xeyalên wî têk çû. Tevahiya cîhanê ji vî berxwedaniyê re şahidî kir. Gelek destanên ku bi gotinan têrê nake mirov bîne ziman, hatin nivîsandin ji aliyê şervanên YPJ û QSD'ê. Şervanan bi tîmên biçûk derbeyên mezin li dijmin xist. Heman demê de li pira Qaraqozaxê jî di şexsê Ezîz Ereb ku li hemberî hemû teknîkên dijmin canê xwe kir mertal da ku dijmin nekeve axa Qaraqozaxê de heta hênaseya xwe ya dawiyê şer kir."

**'Di bin balafiran de gotin em ji mirinê mezintirin'**

Mehmûd axaftina xwe wiha domand: "Gotina em ji mirinê mezintirin serkeftin bi xwe re anî, di bin balafirên şer de dayikan bi tiliyan û bi rakirina tiliyên serkeftinê carek din dan ispatkirin ku çi dibe bile bibe wê berxwedana bendavê bi ser bikeve. Gelê ku li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dijîn ji Dêrikê heta Kobanê. Reqa, Tepqa ta Qamişlo berxwedaniyeke bê hempa dan meşandin û piştgiriya şervanên xwe QSD-YPJ'ê û YPG'ê kirin. Ji roja destpêkê heta Roja îro jî tekoşîneke tê meşandin. Rewşa ku li bendava Tişrînê qewimî ne pêvajoyeke



ji rêzê bû, ruxmê ku dewleta Tirk hemû teknîka xwe li ser gel bi kar anî jî, herwiha gelek birîndarbûn û şahadet jî çêbûn, lê gel bi îradeyeke xort berê xwe da bendavê ji bo parastina av, ax û enerjiya herêmê. Bi gotina ku " em livirin li cem QSD'ê û YPJ'ê ne" bi sloganên "bê QSD'ê jiyan nabe" hêz û moraleke pir xort dida şervanan."

**'23 pêşengên şoreşê bûn misogeriya serkeftina şerê gelê şoreşgerî'**

Mehmûd da xuyakirin ku di sedsala 21'an de li bendavaTişrînê berxwedaniyeke bi rihê şerê gelê şoreşgerî ya bê hempa hat meşandin û wiha got: "Di bendava Tişrînê de rihê şerê gelê şoreşgerî yê şoreşa 19'ê Tîrmehê careke din zindî bû. Di bendavê de jî hat ispatkirin ku dijmin her çiqas di mesafeyeke biçûk de dixwast bi balafiran lê bide jî lê gel bersiva "Em livirin, em naçin "didan. Ji roja destpêkê heta roja dawiyê gelek pêşengên ku di şoreşa Rojava de xwedî nirx bûn wek Menice Haco, Bavê Teyar, Egîd Roj û 23 pêşengên ku me navên wan neaniye ziman hemû jî bi hêrs û menewiyeteke pir mezin derbasî bendavê bûn. Ew gelê ku xwe li ser heqîqet, fikir û felseya Rêber Apo perwerde kiribûn."

**'Rûxmê îmzekirina peymana 10'Adarê jî êrîş didomin'**

Mehmûd Qeremox nirxandinên xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Sûriyê ku bi salên dirêj in di nav geşadan û bûyeran de hatiye hiştîn heta roja îro jî didome. Dewleta Tirk û çeteyên ku bi navê Emşat û Siltan piştê ku derbeyên mezin xwerin xwe paş de kişandin. Peymana 10 Adarê ku di navbera Rêveberiya Demkî ya Sûriyê û QSD'ê de hat çêkirin jî, ji aliyê me de agirbest hat pêkanîn. Lê heta niha jî gef û êrîş didomin, ev jî dide diyarkirin ku aqleke hevbeş di navbera wan de tuneye, lê sîstemeke parçe heye. Kesên ku di nav hikumeta veguhêz de cih digrin piraniya xwe çekdarên tundirew ku ji derve hatine û li gorê telîmatên hikumeta veguhêz yên ku ji dewleta Tirk digrin, tevdigerin."

# Bazirganiya siyasetê bi sedan sal in tên kirin

**Asya Waşûkanî**

Çend sedsale ku gelên Rojhilata Navîn ji destê hêzên, desthilatdarên navendî ên Cîhanê zor û zehmetîyan dikişinin hê jî ew zor û zehmetî berdewam dikin. Weke pergalên sitemkar û tundrew, rê û rêbazên xwe yên mijokdarî û bazirganî li ser gelan, bikar tînin û wan dibin bask û perên xwe de di çewisînin. Pergalên xwe yên dirinde wiha berdewam kirine û anîne di roja me ya îro de jî civakê di nav kiryarên xwe de fetisandine. Em hemû jî dizanîn ku ji beriya 300 salî de, yekitiya Ewropa çi aniye serê gelên Rojhilata Navîn û nexasim jî bi siyaseta Îngilîzan re gelan dinava tora xwe de û wan tengezar dike. Ew siyaseta wan a dagirkirina Rojhilata Navîn, ku her ji wan re xeyalê sedsala bû di sedsala 1900 an de dane pêkanîn û hîna jî pêktînin.

Ji sedsala 19 an pêve, tevahiya herêma Rojhilata Navîn bûye qada şer û xwe li hevdû rakişandina hêzên debdebe û hêzên herêmê jî weke hevkarên xwe, bikar anîne û ew xistine pêsîra hevdû. Weke ku têye zanîn li ser van xakên kevnar û ciyên mîrateyên şaristaniya Neolotîkê ku bi çanda dayikê; ya resen hatibûye hunandin meydanên şer vekirin û deryayên, ji xwînê herikandin. Ji hêlekê de mijokdariyê dikin û ji hêleke din de jî, ketine hewildana ku vîn, nasname û reseniya xelkên herêmê têkbibin û wan ji xwe re bikin ganîmet. Wan weke koleyan bikar bînin û li gorî xwe dîzayîn bikin. Ji xwe weke ku pir zelal têye diyar kirin, pêdiviyên hêzên sereke yên ku şerê Cîhanê yê siyemîn kordîne dikin; bi riyên bazirganiyê yên nû hewildidin ku li gorî, wê ji xwe re nexşereyê çêbikin û li gorî wê hêzên qabiliyeta şer bidin diyar kirin.

Rojhilata Navîn ji Berê de her ciyê hêzên, tundrew û cîhadîst bûye û hîna jî ew hêz li herêmê bibandorin, pir baş têne bikaranîn û gerek were zanîn ku ew hêzên tundrew, xwe li ser mîrateya hişmendîya kevnar a qatilên kastîk didin jiyan kirin. Em hemû jî dizanin ku hêzeke pir erzane ji bo, bikaranînê û mirov dikare bibêje Ku ger dewletên desthilatdar û emperyalist, wan hêzên tundrew ji salên 1900 î de bikar tînin û ew pir baş dizanin ku ger; wan hêzên çete ji bo sudmendiya xwe bikar, neynin tekez wê li berevajî li wan vegere û wê li hemberî wan derkevin û ji bo wan xeternak bin. Tekez wê dinava welatên wan de jî gelek kiryarên, susret û xeternak pêkbînin. Wekê nimûne jî mirov dikare hêzên DAÎŞ ê destnîşan bike.

Hêzên çete yên DAÎŞ ê li Îraq û Sûryê ji bo xwe bikar anîn û hîna; jî wan bikar tînin. Heta niha jî tu hêzê navendî xwe nadin, ber lêpirsîna wan zindaniyên DAÎŞ ê yên ku niha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûryê têne girtîn. Em hemû jî dizanin ku gelên Ewrûpa qebûl nakin ku, ew çete derbasî xaka wan bibin. Siyaseta wan jî dide nîşandan ku bêka, çiqasî hesabên wan dinava hevdû de hene û çawa; hesas nêzî hevdû dibin. Siyaseta dewletên navendî a planên wan, zelal dibe û têye diyar kirin bêka çawa ji kevin de hêzên çete û tundrew bikar tanîn. Çawa Colanî û hevkarê wî rewa kirin, tekez wê tekez di qaîma wan de çend çeteyên din; jî hebin û dibe ku em ji sûprîzên wan matmayî jî bimînin. Hemû mirovahî şahidiyê dike ku Rêberekî, weke Rêber Apo û partiyeke weke PKK ê tevî guhertin û veguhertina stiratejîk û fesixkirinê, jî hîna di qaîma kes û tevgerên tundrew de têne ragirtin û weke hêzeke fermî û aşîtî xwaz, nabînin û ev jî sedema xwe pir zelal diyar dibe. Hêzên desthilatdar û emperyalist, dibingeh de Rêber Apo ji bo xwe xeternak dibînin û hewildidin ku pêştigiriya pêvajoya ku Rêber Apo daye destpê kirin bikin û hemû, dergehan ji şer û tundiyê re vekin. Ji ber vê yekê gerek em jî gelan pir baş bi rêxistin, bikin û bihêlin ku ew jî çalak bibin û li vîna; xwe xwedî derkevin. Tekez gerek dinava raya giştî de were fam kirin ku pêşeng û nunerê, vîna gelan û aşîtîya mayendî Rêber Apo ye. Gerek civaka Kurd û nexasim jî jina Kurd bi, jinan û civakan bidin zanîn ku kilîta çareseriya aşîtî û civaka demokratîk, Rêber Apo ye û ji derveyî wî tu çareserî wê xeyal meyalbe û wê bi mirovahiyê bide wenda kirin.

# Paradîgma Netewa Demokratîk rêya tekane ya çareseriyê ye

Li hemberî hişmendiya netew-dewlet a ku desthilatdaran daye avakirin, Rêber Apo paradîgmeya Netewa Demokratîk "Demokrasî, Ekolojî û Azadiya Jinê" dide pêş. Ev paradîgma ne tenê ji bo gelê Kurd e, lê belê ji bo tevahî gelan e.


**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Rêber Apo li şûna hişmendiya netew dewlet, Netewa Demokratîk pêşniyar dike, ya ku civakeke hevpar û pirreng di nava xwe de digire. Rêber Apo di nav pêşniyarên xwe de yên ji bo çareseriyê, bi taybetî piştî salên 1990'î modela Neteweya Demokratîk pêşkêş kiriye. Ev model, ji modela netew-dewlet ya klasîk cudatire. Netewa Demokratîk, li şûna dewleteke navendî û yekreng, ango birêvebirina nenavendî pêşniyar dike. Ev model, bi taybetî ji bo gelên pirreng ên wekî Kurd, Ereb, Asûrî, Ermenî, Tirk, Fars û h.w.d rêyekê ji bo jiyana hevpar û azad vedike.

Rêber Apo di felsefeya xwe de, bi taybetî di pirtûka xwe ya bi navê "Manîfestoya Civaka Demokratîk" de, paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê wekî bingehên sereke pêşkêş kiriye. Ev sê pêkhateyên sereke ne. Armanca xwe demokrasiye. Civakek ku li şûna hiyerarşî û dewleta navendî, bi awayekî kooperatîf, komun û meclis li gorî prensîbên demokratîk tê birêvebirin. Ev model, bi taybetî ji bo gelê Kurd, rêyek ji bo xwebirêvebirinê vedike, Ekolojîk e. Rêber Apo di felsefeya xwe de, pêwîstiya parastina jîngehê û hevkariya mirov û xwezayê bi awayekî girîng nîşan dide. Ekolojî, ne tenê wekî pêkhateyek siyasî, lê wekî beşek ji jiyana rojane ya civakê tê dîtin.

Rêber Apo di felsefeya xwe de, bi taybetî li ser pêwîstiya azadiya jinê û rola wê di nava avakirina civakek nû de, ev peredîgma destnîşan kiriye. Azadiya civakê bi azadiya jinê re pêkane dibe. Eger jin azad nebe civak jî azad nebe. Ji ber vê yekê Rêber Apo azadiya Jinê esas digire.

Bi venêrîneke netewa demokratîk dema banga serdemê ya Rêber Apo were analîzkirin wê bê dîtin ku Rêber Apo di nav pêşniyarên xwe de, ji bo çareseriya pirsa Kurd, rêyeke aştiyane û bi hevpeymana civakî pêşkêş kiriye. Ew dibêje ku şer û tundî ne rêbazek çareseriyê ne. Ji ber vê yekê ew ji bo hevpeymana civakî û aştiyane, bi taybetî di nav gelên Kurd û dewletên herêmê de, rêya çareseriyê nîşan dide û dibêje: "Zimanê vê demê zimanê aştî û diyalogê ye."




### Peredîgma çi ye?

peredîgma wek têgeh, mêzekirina bûyeran jî diyardeyan e. Rastiya bi pişt bûyer û diyardeyan dîtin e. wek pênasekirina heqîqetê û rêbaza fikrandinê zanist wê kîjan pirsan bike, çi lêkolîn bike, di van lêkolînande çavkaniyên ku ji xwe re esas digire û ji bo ku agahiyan derxe holê rêbazên ku bikaraniyî, paradîgmayê îfade dike.

Thomas Khun têgîna paradîgma bi mînaka çiyayê qeşa ve rave kiriye. Li çiyayê qeşa, beşên wê ên ku li ser avê dimîne de, em teorî û fikir dibînin. Lê paradigmayek ku ew xwe dispêre heye. Sê beşên paradîgmayê jî bi şêwazê zanista hebûnê, felsefeya zanînê û rêbaza zanistê hate pênasekirin. Fikrandina ku zanistê ji felsefe û birdoziyê qut digire dest û tenê rastiyên bi dest tên girtin û bi çav tên dîtin lêkolîn dike bi vî awayî zêdetir rê li ber nîqaşan vekiriye.

### Demokrasî tê çi wateyê?

Ramana peyva Demokrasiyê "Rêvebirina Gel" e. Ev peyv bi koka xwe Yewnanî ye û ji du paran pêkhatîye (demos= xelk, gel û Krasî= Rêvebirin e)

Demokrasî şêwazek xwezayî ya xwe bi rêvebirina gel, ku di nava xwe de hemû deng, reng, pêkhate, netew û ol digire û xwe bi xwe birêve dibin. Bêyî ku desthilatdariyek ji derve wan birêve bibe.

### Rêber Apo demokrasiyê wiha dinirxîne:

Rêber Apo, di paraznameya 'Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Neteweya Demokratîk' de, di beşa 'Çarçoveya Têgînî û Teorîk' de bi van nirxandinan mijara 'Demokrasiyê' ronî dike: "Ji ber ku têgîna demokrasiyê gelekî tê bikaranîn û berevajî cewherê wê tê şîrovekirin, rast danasîna wê girîng dibe. Tevî ku demokrasî gelekî tê bikaranîn li ser têgîna wê aloziyek heye. Belê mirov dikare wê bi awayekî teng û fireh bide naskirin. Bi awayekî fireh mirov dikare wisa bide naskirin, xwerêvebirina civakên dewlet û desthilatdarî nas nekirine. Xwerêvebirina klan, qebîle û eşîran di nava vê kategoriyê de cih digire. Bi awayekî teng jî mirov dikare demokrasiyê wisa binirxîne; civakên di wan de tevî diyardeya demokrasiyê diyardeyên dewlet û desthilatdariyê gelekî têne bikaranîn hene, di van civakan de xwerêveberiyên li derveyî rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê dimînin dikevin vê çarçoveyê.

### Ekolojî diyardeya xwezayê ye

Ekolojî weke têgeh tê wateya zanista jîngehê. Ekolojî an jî zanista jîngehê parçeyeke girîng ji cîhanê ye û di heman demê de di jiyana mirovan a rojane de jî gelek pêwîst e. mirovên demokras an jî têgeha demokratîk ne tenê parastina mafê hemû pêkhate û netew dike lê belê di hundirê xwe de parastina jîngeh û xwezayê jî dike. Cîhanek demokratîk bê parastin ekolojî temama nebe.

Rêber Apo der barê ekolojiyê de dibêje ku ew hişyariya sînordar ku der heqê jîngehê de çêbûye, pêngaveke şoreşgerî pêk tîne. Lewma pêwîst e bi rêya hişyariya civakî siyaseteke exlaqî, hezkirin û rêzgirtina li siruşt û jîngehê bê pêşxistin. Ji ber ku ji ber kapîtalîzmê mirov li jîngeh û siruştê hatiye biyanîkirin.

### Rêber Apo dibêje: "Ekolojî famkirina azadiya jinan e"

Li gor ramanên Rêber Apo têkiliya navbera mirov û siruştê têkiliyeke mîtolojîk e. Ji ber ku gava ku em vedigerin nav naveroka mîtolojiyê, em dibînin ku mîtolojî siruştê wek cismekî zindî dibîne ku her tim bi mirov re di nav têkiliyê de ye. Lê belê bi fikra zanista pozîtîvîst ku çekeke bihêz a lîberalîzm û kapîtalîzmê ye, siruşt tiştekî bê ruh e û di navbera mirov û siruştê de tu têkiliyek tune ye. Nexwe ji bo peydakirina têgihîştineke rasteqîne li hember ekolojiyê, pêwîstiya me pê heye ku em vegerin mîtolojî yan dîroka kevnar a xaka Kurdan. Mijareke din a têkildarî ekolojiyê famkirina azadiya jinan e, bi gotineke din famkirina jineolojî û felsefeya jin, jiyan, azadiyê ye. Ji bo ravekirina vê pirsê pêwîst e ku em li dîroka şoreşa çandiniyê, ango li şoreşa neolîtîkê binêrin ku 12 hezar sal berî çêbûna şaristaniyeta desthilatxwaz, baviksalar û şîdetxwaz a Sumeran pêk hatiye. Jin her dem pêşenga civakê bûye û xwedîtî li destkeftiyên mirovatiyê kiriye û xwedawenda erd û asîmanan bûye. Di dawiyê de em dibêjin ku zanista ekolojiyê, bi taybetî di modernîteya demokratîk de, hezkirina ajal, siruşt û hemû jîngehê hezkirina ji mirovan e. Ango têkiliya li gel siruştê û bi wê re yekbûn gewherê aboriya civakî ye. Bi gotineke din tenê ne girîng e ku em daran biçînin, her wiha divê em felsefeya çandina daran jî fam bikin.

### Azadiya civakê bê azadiya jinê pêk nayê


Felsefeya Azadiyê ya vê serdemê ji aliyê Rêber Apo ve hatiye formulekirin, Jin Jiyan Azadî ye. Dirûşma Jin, Jiyan, Azadî ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye pêşkêşkirin, di nav tevgera Kurdî de wekî drûşmeyek sereke hatiye qebûlkirin. Ev drûşme, ne tenê ji bo azadiya jinê, lê ji bo azadiya giştî ya civakê jî tê dîtin. Rêber Apo di felsefeya xwe de, bi taybetî li ser pêwîstiya azadiya jinê û rola wê di nav avakirina civakek nû de, destnîşan kiriye.

Ji bo civakek hevpar û jîngeheke guncav azadî û fikirên jinê girînge. Di pêkanîna demokrasiyê de yek ji şaxên wê yê sereke qebûlkirina jin e. Piratîka demokrasiyê bêyî jinê pêk nayê. Parastina taybetmendiyên jinan ji parastina ekolojî ye.

### Jin pêşenga vê civaka nû ye

Rêber Apo di felsefeya xwe de, azadiya jinê wekî bingehê azadiya giştî ya civakê dibîne. Rêber Apo dibêje ku "Civakek ku jin azad nebe, nikare bi xwe azad be." Ji ber vê yekê, di nav pêşniyarên xwe de, rola jinê di nav civakê de bi awayekî nûjen û bihêz tê nîşandan. Jin pêşenga vê civaka nû ye, ji ber ku xwediyê felsefeyek e kûr e.

## Bê Komûn Çareserî Nabe!



**Sînan Cûdî**

Biryara Amerîkayê ya rakirina dorpêçên li ser Sûriyeyê serdemeke nû vedike. Her çend ev biryar wekî gaveke ber bi normalîzekirina ku navenda wê Şam e tê şîrovekirin jî, pirsa rastîn ji bo Rojava û Kurdan ev e ku di vê pêvajoyê de li ku bisekinin?

Her çend Washington pirsgirêka Sûriyeyê vediguhezîne qada têkiliyên navbera dewletan jî, Rojava, ku li ser erdê aramiyê diafirîne, bi eşkere wekî lîstikvanek sereke nayê destnîşankirin. Ev rewş ji bo gel û avahiyên siyasî yên Rojava wekî hişyariyekê ye. Serdema nû bi tena serê xwe derfetan naafirîne; heke neyê kontrolkirin, ew ji hêla yên din ve tê şekilkirin. Rakirina dorpêçan dibe ku di jiyana rojane de rihetiyek qismî biafirîne. Dibe ku alîkariya mirovî were hêsankirin, dibe ku bazirganî zêde bibe û dibe ku di sektorên enerjî û tenduristiyê de başbûnên bisînorkirî werin dîtin. Ev bandor li Rojava jî pêk bê. Lêbelê, ev destkeftî bêyî îradeya siyasî û helwestek civakî ya rêxistinkirî nikarin bibin mayînde. Hêmana ku heta niha Rojava li ser piyan hiştiye ne piştgiriya derve ye, lê rêxistina civakî ya li ser bingeha komunan e. Îro, hemana girîng, parastin û xurtkirina vê bingehê ye. Rîska rastîn ew e ku rakirina dorpêçan dê dewleta navendî xurt bike û ev xurtkirin, dê qada siyasî ji bo Kurdan teng bike. Her ku Şam ji hêla aborî û dîplomatîk ve baş dibe, daxwazên Kurdan dikarin werin paşxistin. Di vê nuqteyê de, berpirsiyariya bingehîn a siyasetmedar û saziyên li Rojava eşkere ye: bibin aktorek rasterast di pêvajoyê de, ne ku di pozîsyona çavdêriyê de ji dûr ve bimînin. Ev ne karekî ye ku bi têkiliyên dîplomatîk ve sînorkirî ye. Hêza rastîn ji îradeya rêxistinkirî ya gel tê. Sîstema neteweya demokratîk li vir çarçoveyek biryardar pêşkêş dike. Divê komun tenê wekî yekîneyên îdarî yên herêmî neyên dîtin. Ew, bingeh in ku îradeya siyasî lê çêdibe. Di vê pêvajoyê de, erkê gelê Rojava ew e ku komunan zindî bihêle, meclîsan bike hêzek çalak û pirsgirêkên rojane bi hişmendiya siyasî nîqaş bike. Ji bo siyasetmedarên Rojava, erk zelaltir e. Divê ew ji zimanekî navendî-ewlehiyê derkevin. Pêwîst e perspektîfeke bingehîn li ser pêşeroja Sûriyeyê were çêkirin ku mijarên wekî statuya destûrî, rêveberiyên herêmî û parvekirina çavkaniyan bi zelalî werin diyarkirin. Divê ev daxwaz ne bi şêwazekî ku ji jor ve hêvî dike, lê bi zimanekî ku li ser îradeya rêxistinkirî ya gel hatiye avakirin, werin parastin. Komûn, li vir pişta siyasetmedaran in. Gava ku siyaset ji komûnan veqete, ew bi danûstandinên derveyî ve girêdayî dibe. Di vê serdema nû de, hêza herî mezin a Rojava ne kapasîteya wê ya leşkerî ye, lê modela wê ya civakî ye. Serokatiya jinan, ezmûna jiyana pirzimanî û pirnasnameyî û sepandina pratîkî ya demokrasiya herêmî hîn jî wê ji mayî ya Sûriyeyê cuda dike. Ger ev model neyê parastin, dê ti zemînek ji bo parastina wê ji derve nemîne. Ji ber vê yekê, beşdariya çalak a gel di pêvajoyê de pir girîng e. Di encamê de, biryara Dewletên Yekbûyî ya Amerîka ya rakirina cezayan ji bo Rojava astengekî pêk tîne. Ger ev asteng bi pasîf were derbas kirin, windakirin dê zûtir bibe. Ger bi awayekî çalak were bicîhanîn, dê derfetên nû derkevin holê. Beşdarbûna gel bi rêya komunan, piştgirtina siyasetmedaran bi vê îradeyê di gotûbêjên xwe de û parastina domdar a perspektîfa neteweya demokratîk erkên bingehîn ên vê serdemê ne. Pêşeroja Rojava dê di komunan de were şekildan, ne li ser maseya danûstandinan. Heta ku ev rastî neyê jibîrkirin, her çend hevsengiyên derve biguherin jî jiyana ku ji hêla gel ve hatiye avakirin dê bidome.



# Koçberên Efrînê: Ji ber nebûna dibistanê zarokên me bê xwendin mane

Koçberên Efrîn ku li Focê Terteb ê nêzî bajarê Qamişlo bi cih bûne diyar kirin ku 53 zarokên wan ji refa 1-6'an ji ber nebûna dibistanê bê xwendin mane. Herwiha Koçberan bang li Desteya Perwerdeyê kir ku ji bo zarokên wan dibistanekê li wir ava bike.



Helîme Yûsêf



Mizgîn Îbo



Fîras Ebdulah



Neîme Ebdulah

**Aryan Hesen/Qamişlo**

Di serdema Rêjîma Baas de li Sûriyê zimanê Kurdî qedexe bû, Kurd ji zimanê xwe yê dayîkê mehrûm mabûn. Neçar dibûn ku di dibistanên Erebî de bi zimanê Erebî bixwînin. Rêjîma Baas ku li ser hişmendiya yek ziman û yek netew rabûye ji derveyî zimanê xwe tu ziman qebûl nedikir. Lê piştî şoreşa 19'ê Tîrmahê ango şoreşa Rojava, bi ked, berxwedan û israra gelê Kurd hebûna zimanê Kurdî dîsa vejîn bû.

Di 2018'an de bajarê Efrînê ji hêla dewleta Tirk a dagirker û çateyên pê ve girêdayî hat dagirkirin, di wê demê de ne tenê koçberî, zehmetî, kuştin û revandin çêbû, lê belê xewna zarokan jî di nîvî de ma û winda bû. Zarok neçar man ku ji xwendina xwe dûrbikevin. Lê piştî koçberkirina gelê Efrînê li herêma Şehbayê, dîsa gelê Efrînê xwendina zarokên xwe bi zimanê Kurdî berdewm kir, rixmî ku li Şehbayê dibistanên Rêjîmê hebûn, lê gelê Efrînê zimanê xwe dane pêş. Lê mixabin çareke din di 2 Kanûna 2024'an de gelê Efrînê ji ber êrîşên komên çeteyan neçar man ku koçber bibin û berê xwe bidin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ev xwendekar careke din mecbûr man ku ji xwendina xwe dûrbikevin. Ev yek bandoreke mezin li xwendekarên Efrînê kir du caran xewn û xeyalên van zarokan hat têkbirin. Lê niha jî dîsa xwendina xwe li dibistanên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdewam dikin. Lê belê li kêleka wê jî hin xwendekar ji ber kêm alîkariyê bê xwendin mane û pêşeroja wan winda bûye. Di foca rêjîmê ya berê ku girêdayî gundê Terteb yê nêzî bajarê Qamişlo li komîna Şehîd Cûdî Efrîn 53'ê xwendekarên ji refa 1-6 bê xwendin mane, ev saleke berdevkên komînê û malbet banga alîkariyê dikin, lê bê bersiv mane.

Di vê çarçoveyê de berdevka komîna Şehîd Cûdî Efrîn û melbetên zarokan ji Rojnameya me re axivîn.

### '53'ê zarok bê xwendin mane'

Berdevka Komîna şehîd Cûdî Efrîn Helîme Yûsêf diyar kir ku ev saleke ew daxwaze vekirina dibistanê dikin û wiha got: "Li vê komîne 53'ê zarokên ji refa 1-6 bê xwendin mane û ev demeke em daxwaza vekirina dibistanekê dikin, lê tu bersiv ji me re nehatiye. Îro şerê me ji bo zimane, lê zarokên me bê xwendina bi zimanê dayîkê mane. Herwiha ji refa 7-12 dibistan ji wan re jî tune ye, ew neçarin ku biçin dibistanên dûr, ew bi erebeyan diçin û pereyekî zêde li rê didin, hin malbet hene ji ber rewşa aborî ya zehmet tenê zarokekî xwe dişînin dibistanê û yên din bê xwendin dimînin.

Banga me ji bo Desteya Perwerdê ku ji van xwendekaran re dep, danîştekan û cihekî çêbikin û eger memoste tune bin , ew xwendekarê refa 12 dikarin waneyan bidin, tenê alîkar bin."

### 'Xwendina zarokên me dîsa nîvçûyî ma ye'

Dayîka bi navê Mizgîn Îbo destnîşan kir ku ji ber du caran koçberiyê zarok bê xwandin man û wiha domand: "Piştî em ji ŞehBayê koçber bûn me berê xwe da bajarê Qamişlo û em di foca Tertebê de bi cih bûn. Xwendina zarokên me dîsa nîvçûyî ma, niha jî 4 zarokên min hene yên di refê navîn û amadehî de diçin dibistanê, rojane em jê re tirmbêlê digirin û di zarokên min yê din jî ji ber kêm derfetê ez nikarim wan bişînim û bi xwendin bidim. Em di dema rêjîme de bê xwendin man, niha jî em nexwazin ku zarokên me bê xwendin bimînin. Ji bo vê jî banga me ji tevahî kesê eleqedar re ku xwedî li pêşeroja van zarokan derbikevin û derfeta xwendinê ji wan re peyda bibe."

### 'Li foca Terteb derfeta xwendinê tune ye'

Koçberê bi navê Fîras Ebdulah da zanîn ku li Şehbayê di nava derfetên kêm de zarokên wan diçûn dibistanê û wiha pê de çû: "Piştî du caran ji koçberiyê zarokên me bê xwendin mane, li deverên din derfetên xwendinê hene, lê li foca Terteb derfeta xwendinê tune ye, eger derfeta anîna memosteyan tune bin, bi me re alîkar bin û servîsa ji zarokan re werin peydakirin ku biçin dibistanên din. Ev sê carin rêxistinên mirovî tên, lê bê encam bû. Heya niha hebûna me ji bo zimanê me ye, ji bo vê jî em dixwazin ku zarokên me bi zimanê xwe mezin bibin, banga me ji bo tevahî gel, rêveberî û rêxistinan re ku ji bo pêşeroja van zarokan bixebitin."

### 'Em dixwazin ku dibistan werin vekirin'

Zaroka bi navê Neîme Ebdulah diyar kir ku daxwaza wê xwandina bi zimanê Kurdî ye û wiha got: "Ez refa 4'emîn im, dixwazim ku dibistan were vekerin ji bo ku em xwendina xwe berdewam bikim û fêrî zimanê xwe yê Kurdî bibin."

# Taxa Kornîş şahideke zindî ya pirrengî û dewlemendiya civakî ya Qamişlo ye

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Taxa Kornîş li Qamişlo yek ji taxên bajêr a herî berbiçav û sereke yê. Ev tax di sala 1970'î de hate avakirin û niha bûya navendek girîng ji çalakiyên bazirganî û civakî re, herwiha ev tax şahideke zindî ya pirrengî û dewlemendiya civakî ya Qamişloyê ye.**

Taxa Kornîş di 1970'î de hate avakirin, hêdî hêdî ji taxeke bêdeng a derdorê veguherî yek ji navendên herî girîng ên çalakiyên aborî û civakî li bajarê Qamişlo. Îro, ev tax bi dikan, ofîsên taybet û xwaringehan, bala niştecih û mêvanan jî dikişîne. Tax li Bakurê xwe bi taxa Siyahî ve sînordare, li Rojava bi riya Hesekê, li Başûr û li Rojhilat jî bi rêya Hîzam û çerxerya AL-Selam ve sînorkirî ye. Di dema heyî de dii vê taxê de 25 hezar mal hen.

### Taxa Kornîş bi pirrengiya pêkhateyên xwe navdar e

Taxa Kornîş wekî navendeke bazirganiyê ye ku firoşgehên cil û pêlavan, xwaringeh û ofîsên cûr bi cûr li ser kolana wê ya sereke hene. Ev tax cihekî civakî ye ku niştecihên Qamişlo bi pêkhateyên cûda lê dicivin wekî; Kurd, Ereb, Suryan û Ermen. Ev pirrengî karakterê cihêreng ê bajêr nîşan dide. Di heman demê de xelkê wê bi welatparêziya xwe navdar in û ji destpêka Şoreşa Rojava ve gelek şehîd ji vê taxê hene .

**Jiyana Rojane**



Taxa Kornîş taxek zindî dimîne. Kolanên wê yên qerebalix û kafeyên wê yên modayî wê dikin xalek hevdîtinê ya ji bo xelkên bajêr.

Taxa Kornîş li Qamişlo, ew damareke aborî û civakî ya girîng e. Di nav geşbûna bazirganî û pirsgirêkên xizmetguzariyê de, ev tax yek ji taybetmendiyên bajarî yên herî berbiçav ên Qamişlo û neynikeke rastiya wê ya rojane ye.

Taxa Kornîş hîn jî şahidiyek zindî ya pirrengî û dewlemendiya civakî ya Qamişlo ye ku reseniya bajêr, dîrok û zehmetiyên hemdem nîşan dide. Her çiqas niştecihên wê hewl bidin ku nasnameya wê biparêzin û xizmetên xwe pêş bixin, ev tax beşek girîng a bîr û pêşeroja bajêr dimîne.

## Sala çû û ya nû



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Me salekî din li pey xwe hişt. Divê em hemû carekî li paş xwe mêze bikin û bihizirin, ka me çikir? Salekî çawa derbas bû? Qezencên me yên manewî û yên maddî çi ne? Me ji bo xwe, malbata xwe, gelê xwe, welatê xwe, ola xwe, fikr û ramanên xwe û mirovahiyê çi kir?

Bêguman dem me derbas dike û diherike, lê ji ber mirov jî dimire divê tiştên baş û qenc pêk bîne.

Ger mirov xwe berçav de derbas bike dê bibîne li vê jiyanê giraniya wê çiqase.

Weke milletekî ku di serdema 21'an de hê pirsgirêka xwe ya nasnamê sererast nekiribe divê dema pêş bi bazdanê tije bike.

Milletê me bi salan e ji bo mafên xwe yê netewî berxwe dide û tekoşînekî bê hempa dimeşîne. Şoreşa çekdarî ev çil sal e berdewame û sala çûnê bi stratejiyekî nû çek hatin seknandin.

Neha em weke Neteweya Kurd ketin merheleyekî nû de. Sed sal e Kurd ji hêla sîstema bireveberên cîhanê ve hatine dorpêçkirin da ku siyasetê û dîplomasiyê nekin.

Bi dijberiya hemû desthelatên cîhanê ve Kurd tunne hatin hesibandin û Kurd hatin înkarkirin. Kurdan bi tekoşîna çekdarî hebûna xwe bi cîhanê dan pejirandin.

Bizava Kurdî ya pêncî sal e didome vê sala çûyî stratejiya xwe guherand. Divê li gor vê stratejiye jî kar were meşandin.

Sala çu weke millete Kurd ciwanên me nehatin qetilkirin û eva destkeftiyekê mezin e.

Rêya siyasetê hate vekirin, Kurd nêzikî hevdû bûn. Li derve û hundirê welat guftugo zede bûne û Kurd ji bo yekitiya xwe pêş bixin gavên berbiçav avêtin.

Rojavayê welatê me ji bo destkeftên xwe mayinde bike, berbi pêşve diçe. Perwerdeya xwe pêşdixe û dike navnetewî. Werzişa Kurdan pêş dikeve, weke kesayet û weke tîm jî berbi pêşve diçe. Denîz Undav û Egît Kabayil weke Werzişvanên Kurd tîma Amed, Wan û Elîhê berbi pêşve diçe, Tîma Zaxo di Federasyona Gokê de bû Tîma herî bi alîgirên baş.

Neyarên Kurdan jî ji bo Kurdan bixapînin û wan têk bibin bi liv û tevger bûn, lê li beramber millete Kurd biser neketin.

Di sala nû de divê Kurd destkeftên xwe mayinde bikin û pêştir bibin.

Vê salê divê em weke kesayetên Kurd, di hemû hêlên jiyanê de xwe nû bikin. Derfetên me ji berê zêdetirin. Divê ji aboriyê bigre heya siyasetî, ji zanist bigre heya hemû hêlên perwerdê, Ji werzişê bigre heya dîplomasiyê sazîbûnek were pêkanîn.

Divê di sala nû de Kurd, weke kesayet, malbat û netew xwedan hemle û pêşkeftinên cîddî bin.

Dem gellekî girînge divê weke milletê Kurd dem pir tije were derbaskirin.

Fexreddînê Razî dibêje sermaya mirovî emre wî ye.

Suretekî heye di Qur'ana pîrozde Xweda li ser demê sund dixwîne. Navê sureyê Sureya "Esr" ê ye.

Zanyarekî dibêje min ev sure fêhm nedikir: ez çûm Bazarê min dî yek Berf firoşekî bang dike û diqêre: hawar ez gunehim, sermaya min cemede, berfe zubikin bigrin, waye tav derdikeve ewê samana min bi hele, ji bo Xwedê alîkariya min bikin.

Divê em zanibin weke mirov temenê me sermaye û samana me ye, li beramber demê em nikarin xwe bigrin, her sal ji temenê me diçe. Divê em temenê xwe bi tiştên baş tije bikin da ku em karibin xwe mayinde bikin. Sala nû ji mere xebata ser başî û qenciyan bîne.

Sersala we pîroz be.